


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

84
2022





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 84 / 2022
Ansvarig utgivare: Alî Çiftçi
Editor: Alî Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Alî Çiftçi, Asya Xerzan, Altun Başaran, Seyfî Dogan,
Wehîde Memkê Hesê Mihe, Mem Xelikan,
Sevgî Erdem, Muzaffer Özgür, Hayrettin Güven,
Amed Tîgrîs, Rojîn Zarg Tîgrîs, Nuh Ateş,
Mehtab Îdelî, Xizan Şîlan, Emrah Altun, Memduh Selim

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Bask: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 10 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 130/6, Beyoğlu

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîr,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandî.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Zîman li Almaniyayê piştgirîna kovarê ne.

bîrnebûn

84 2022

ISSN 1402-7488

Wêneyê berga pêşîn: Khairî Adam/Başûr
Rengê rûn/112 x81 cm

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçi
Şeva Mekteba Şemîyê li Stockholmê	6	Hayrettin Guven
Kilamên me, Kaniya jêrî	10	Mem Xelikan
Cihanbeylî û êşa 52 rojan – 3	12	Muzaffer Özgür
Bisk û gulî	18	Mehtab Îdelî
Qerfo / Quto	26	Seyfî Doğan
Bi dayika min Zêza Zewê Silê Atê va li ser biwêjan	28	Wehîde Memkê Hesê Mihe
Bênav	32	Xizan Şilan
Fata Usê	33	Altun Başaran
Koçberî û dengbêjî	34	Memduh Selim
Helbest	38	Seyfî Doğan
Xwe şaş neke	39	Asya Xerzan
Dengê dayika min – I	40	Hayrettin Guven
Begê Rewandûzê	42	Jordan
Talde	46	Bêrivan Xizênzêr
Evînek li min peyda bû	49	Mûlla Evîndar
Ludîngîr	50	Seyfî Doğan
Em gîşt qiral in	52	Oscar Wilde, Wergera ji almanî: Nuh Ateş
Darkêşê taxa Tokiyê	56	Amed Tîgrîs & Rojîn Zarg Tîgrîs
Malê dizan nabe	59	Mem Xelikan
Di çêkirina bîra kolektîf a kurdên Anatoliya Navîn da rola kovara Bîrnebûnê	66	Sevgî Erdem
Memoyê Hecî	84	Emrah Altun

Ji Bîrnebûnê

Azadîya çapemenî û derbirînê bingeha demokrasiyê ye. Bûyerên ku nayên qebûl kirin li Tirkîyeyê bi salan e berdewam dikin, lê xuya dike ku niha bi leztir dibe ji ber hilbijartin nêzîk dibe. Di dema krîza koronayê de, li Tirkîyê medyaya dilsoz a demokrat û azadîya çapemenî û derbirînê hat qedexekirin û bi berdewamî êrişî mûxalîfan têye kirin, ne tenê yên li welêt, lê li welatên din jî mûxalîfên wekî parlamentêrên swêdî jî ber ku di parlamentoyê de rewşa kurdan anîbûn rojevê.

Tirkiye li ser Bakurê Sûriyê (Rojava) di van demên dawî de gelek bombe barandin û hîn jî berdewam in, dijî qanûnên navdewletî ye ku bûye sedema piranîya kuştîyan. Êrişên Tirkîyeyê yên li ser kurdan û herêmen kurdan dubare dibin. Ew êrişên li hember muhalîfan û bi taybetî ya li ser kurdan tên kirin, tesîreka pir xirab li zarokên kurdan dike.

Kurd weke etnîk xwadîdîrokeka dûr û dirêj in. Welatê Karda berîya zayînê bi 3000 sal berê ji alîya sumerîyan ve bahsa karda

hatiye kirin. Îro bi giranî kurd li Îran, Irak, Sûriyê û Tirkîyeyê dijîn. Li Lubnan, Ermenîstan, Kafkasya û Azerbeycanê jî wek mînorîte kurd hene û di van salên dawî de jî pir li Ewropa û Amerîkayê dijîn. Dîroka kurdan bi şer, êş û koçberî ve dagirtiye. Kurd di Rojhilata Navîn de yek ji çar netewayên herî mezin in. Lê hîn jî li ser rûyê dunê nebûne xwadiyê tu statûyekê!... Şopên şer, koçberî û êşên wan di vê hejmarê de jî hûn ê bibînin.

Zimanê kurdî, faktoreke hevgirtinê û nasnameyê ya herî girîng e. Di têkoşîna kurdan a ji bo bidestxistina mafên xwe de, pir caran girîngîya axaftina bi kurdî derdikeve holê.

Di dema niha de teknîka ragîhandinê bi pêş ketiye û derfetên rind peyda kiriye ku li kuderê cîhanê be jî meriv dikarin xwe bigihînin zanyarîyan. Lê li alîyekî jî bûye sedema asîmîlekirineka xelkên wek me bîdewlet.

Mixabin dema em bala xwe didin rewşa zimanê kurdî, bi taybetî bo kurdên Bakur û yên

Anatolîyê, çî li welêt û çî li derveyî welêt be, em dibînin ziman di nav zarok û ciwanên me de zayîftir e.

Waqfa Kurdên Anatolîya Navîn ku di bihara sala 2002an de li Stockholmê ji alîyê 30 kurdên ji Anatolîyê ve bi fermî hatibû avakirin. Ji bo pêşvebirina çand ziman û xurtkirina nasnameya kurdan di sala 2019an de ji bo vekirina mektebeka roja şemîyê xebatek dest pêkirîbû, ji ber sedemên sawa Covid-19an demekê navber hatibû dayîn. Ji payîza 2021an de waqîfê dîsan dest bi xebata xwe ya mekteba şemîyê kir. Ji bo dawîya termîna biharê ya îsal bi şahîyeka ji bo dê, bav û zarokan li Stockholmê hat çêkirin. Xebera vê bi sernivîsa *Şeva Mekteba Şemîyê li Stockholmê*, Hayrettin Guven li gel wêneyên berhemên zarokan nivîsandîye.

Koçberî ji ber çî sebebê dibe bila bibe, di jîyana însanan de bandoreka mezin dike. Guhartin, pêşketin, xemgînî, hesreta

warê dê û bavan di nav xwe de dihevwîne. Roj, meh, demsal û sal derbas dibin, hesreta dê û bavan, xwîşk û bra, nas û hevalan, ciran û dostan, derûdoran û hezkirîyan digihên ser hev. Ev li ser merîya diltengî, dilzîzî, xemgînî û êşa hesretê peyda dike. Di nav civata me ya Anatolîyê de pirê caran di kilaman de ev rind xuya dike. Birêz Memduh Selîm û Mem Xelîkan di vê hejmarê de li ser koçberî û xizanîyê nivîsandine.

Ev hejmara jî wek hejmarên berê bi nivîsên lêkolînî yên Mehtap Îdelîyê li ser *bisk û gulî*, Sevgî Erdemê lêkolîneka berfireh a di çêkirina bîra kolektîfa kurdên Anatolîyê de rola kovara *Bîrnebûnê* ve hatiye dagirtin.

Bi hêvîya ku hûn ê ji helbest, serpêhatî, hekat û kurtenivîsên vê hejmarê sudê werbigrên, havîneka xweş û aram ji bo we gîştikan ji dil hêvî dikim. Bimînin di xêr û xweşîyê de heta hejmara bê!

Alî Çiftçî



Şeva Mekteba Şemîyê li Stockholmê

Hayrettîn Guven

Mekteba Şemîyê ya Stockholmê ku ji alî Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn ve hatîye damezrandin bo dawîkrina termîna vê salê ji bo dê û bav û kurikên(zarokan) mektebê şahîyek li dar xist.

Şeva Mekteba Şemîyê bi piştgirî û alîkarîya APEC, Bîrnebûn, restoranga Parabolenê çêbû.

Li paytextê Swêd, li Stockholmê hewa germ bû wê rojê. Asîman bi rengêkî heşîn û ewrên spî ve hatibû xemilandin.

Restoranga Parobolenê li deşta Hanîngeyê ye. Cîyêkî berfireh bû.

Dora saet 16an dê û bav û ku-

rik û mêvanan dest pê kirin hatin. Nêzikî 180 kes beşdarî şevê bûn. Kurmancên deşta Konyayê û soranên deşta Silemanî û Hewlerê li ba hev rûniştin wek merivên çend salan. Hevaltîya zarokan li mektebê, ew hemû dê û bav kirin dost, heval û merivên hev.

Şev ji alîyê Sevîm Guven ji gundê Omera û Loghman Nestanî gundê soran ya Nestanê ya Rojhilat ve hat pêşkeş kirin. Kurmancî û Soranî li rû hev hat vergerandin.

Herduyan ji xêrhatina mêvanan kirin û bernameya şevê pêşkeş kirin. Şev bi helbesta Sînan Şahîn



a bi navê *Xemzîstan* dest pê kir.
 Ji Koma Surgunê Keko bi dilekî
 germ û dengê xweşik ew helbest
 bi devoka Anatoliya Navîn hatibû
 nivisandin, xwend. Helbestwan
 digot;

Bi gundan re şevitîn
Hêlinên dûmeqesan
Zivistana êdî xemzîstan e
Bê,

Sewê kenekî te
Min çend tirbên spî pa!

Piştî helbestê sînevîzyona ku ji
 çalakîyên mektebê hatibû hazir-
 kirin bi destê xwişka Newal hat
 amade û temaşakirin.

Piştî sînevîzyonê kek Îsmet
 Aktaş xêrhatina mêvanan kir, bi
 navê Waqîfê.





Xwişka Berîvan wek dê, Zohre wek mamoste dîtînen xwe li ser mekteba şemîyê gotin.

Berîvanê got: kurikên min pir ji mektebê hez dikin, her heftî em tînin û ez dibînim ku kurikên min baştir ferî kurdî dibin û niha baştir fêr dikin.

Mamoste Zohre got: em wek mamoste ji dilda kar dikin û mektebê wek mekteba xwe û zarokan wek zarokên xwe dibînin.

Endamê rêvebirîya waqîfê Hayrettîn Guven behsa rewş û pêşaroja mektebên şemîyan kir. Mîzgênek jî da bû û got, waqîf mekteba şemîyê ya sêyemîn piştî havînê li bajarê Gävle ya Swedê vedike.

Hûnermendê hêja û peykerwan û mamosteyê atelyeyê li mekteba

şemîyê Seywan Saedîan behsa girîngîya hûnerê bo zarokan û bo civakê kir. Hûnera ku dê û bavên û kurikan ku ji alî wêne û seramîk bi alîkarîya hûnermed Runak Resulpur çekirî bûn li kûncikekî restorangê amade kir.

Piştî xwarinê, hemû kurikan dîplomeyên xwe ya salê girtin ji destê mamosteyên pola xwe. Kurikên di dorê de bi kelecaneke mezin li benda dora xwe ya dîplomegirtinê dibûn. Her kurik mamosteyên xwe hembêz dikirin û dîmêşîn hembeza dê û bavên xwe û dîplomeyên xwe nîşanî wan dikirin. û dev bi ken bûn.

Dûre dor hat kilam û govendê Ji koma Heval, Rizgar û Serkan, ji koma Surgunê Keko, Hozan



Atilla, Hozan Gursel, Hozan
Harun Cinar wek hozanek surprîz
û Hozan Berfin Aktay wek hozana
dawî bi kilam û helbestan car caran
em xêmgîn dikirin û car caran jî
em bi coş radikirin ser pîyan di
govendê da.

Çend zarokên me ji me re ki-
lam jî gotin.

Ella, Zeyneb û Narinê digotin,
Li baxê min bû zivistan hey dîlberê.

Şev şeva zarokan bû. Dilîstin,
dimeşîyan û dikenîn.



KILAMÊN ME (IX)

Mem Xelîkan

KANÎYA JÊRÎ

Evîn û evîndarî, di çanda her gelekî de heye. Jiya-na gel bi rewşa civakî û aborî ve jî girêdayî ye. Ji ber pir sedeman, pir caran evînên hezkiirî û dildaran bi bextewarî bi dawî nê. Tîjî êş û jan in. Xizani û tineyî, bêkesî, ji dest xêrnexwazan hwd, eşq û evînên hezkiirî û dildaran narin sêrî û ew nagêjin ber miradê xwe.

Hekata strana *Kaniya Jêri* jî, heketa evîna du hezkiirîyên negêştine ber miradê xwe ye. Strana Xelikên jor e. (Qerecdax – Kulu – Konya). Straneke, pismam li ser hezkiirîya xwe, li ser dotmama xwe straye. Xortê ku ew strana straye, hê salbiçûk e ku bavê xwe ji ber nexwaşîyekê wenda dike. Dayîka

wî jî, hê bûkeke salbiçûk e. Li ber wê jiyanek dirêj heye. Çend salan şuva, lawikê xwe sêwî cih dihêle tere mêrekî dike. Ew xorta, bê dê û bav sêwî ma şuva, xwanga wî ya ji bavê, xwanga mezin wî dibe mala xwe û wî mezin dike.

Ew xorta, li 14-15 salîya xwe ji cîranan re reçberîyê dike. Karên wana î malê dike û pê debara xwe dike. Li wan salana, wek her xortekî dilekî xwe digire. Dilê wî dikeve dotmama xwe. Lê mala tineyî û bêkesîyê bişewite. Xizani û tineyî dikeve navbera dilê wan dildaran. Apê wî keça xwe di-de yekî bi heyî û salmezin. Ew evîndar jî nagêjin ber miradê xwe. Lê ji wê evînê strana *Kaniya Jêri* ji me ra ma.



KANÎYA JÊRI

Kanîya Jêri bitûn silk e
Xwî li narîna min ketiye nuk bi nuk e
Destî xwe di destî min ke
Hikmat rabe lê narînê fide nake

De êdin were dilî min di dorê
Xwedê nekir lê narînê qe ne bi zor
Ewrê barê girmegirm e
Li xwe meke lê narînê qutnî sirme

Destî xwe destî min ke
Motirê heşin bidinî cirm e
De êdin were dilî min di dorê
Xwedê nekir lê zalimê qe ne bi zorê

Bîranînên bi êş yê jineka rojavaya Tirkîyê

Cîhanbeylî û êşa 52 rojan

— 3 —

Muzaffer Özgür

Roja da dû hefta, hefta da dû me-
ha û demsal derbas dibûn. Ez êdî
li qeza Cîhanbeylî dijiyam û bi
kêfekî serbilind li ser
karê xwe bûm. Li nex-
weşxana me karê me pir
bû. Ji hatina min bi
şûnve doxtirek û
hemşîreyeka din jî ha-
tin. Dewletê dest bi
kampanyaka nû ya aşîya
kurikên li dibistana
kiribû û serokdoxtorê
me, ez ji bo vî karî
vazîfedar kirim. Em, sê kes bûn.
Ez, alîkara min û şoferê me. Ereba
û şoferê me ji alîyê qaymeqam va
hatin amadekirin. Li dawîya çend
civînan, me dest bi karê aşîkirina
kurikên li dibistanan kir.

Bi vê kampanyayê, ez pir li
gundên Cîhanbeylîyê gerîyam,



min gundê kurdan, gundê tir-
kan û yê tetaran dîtî. Carcaran
li dor Gola Xwê, carcaran jî
li deşt û çîyayên
Cîhanbeylîyê li ser
rê bûm. Deşt bêyî
dar û daristan bû.
Çoleka zîya û bêav
bû. Li çol û banîyan
kerîyên pêz û naxir
diçêrîn. Gundên dor
alîyê xwê di bin toz
û bahozên qirêj û
bi xwê de bûn. Ew

gundê kurdan bûn. Deşta wan pir
mezin bû, zozanên wan jî hebûn.
Kerîyên wan ê pêz di nav toza
çolê de bi dengê zengilan diçêrîn.
Zevîyên gênim û cê bêdawî bûn.
Dema bahoz derdiket, zevî wek
behra bajarê min dihejîya. Kêfa
min gelek ji vê dihat. Min xwe, li

ber behra bajaroka xwe didît. Dema em di kêleka zevîyan re derbas dibûn, min cama arebê vedikir, behna dinyayê digirt hundirê xwe. Azadî dihat bîra min, azadî û kêfxweşî ji bo merivatîyê pir gereg e. Şoferê me û alîkara min bi min dikenîn, henekên xwe dikirin. Wan xeribî neditîbûn, ez fahm nedikirim. Ji bo wan tişteki normal bû, çûyîn û hatina gundan, çimkî ew ji vir bûn. Welatê ez jê hatibûm di nav dar û daristanan da bû. Min kerîyên pêz li vir dîbûn. Di nav zevîyên bêsinor de li vir gerîyabûm. Van hîs û ramana nikanim bînim ser ziman, lê gelek xweşik bû. Şoferê me tirkekî ji vir bû û gund gîştik nas dikirin, ji ber ku di qeymaqamîyê de kar dikir, mixtar û kesayetên gundan nas dikirin. Em diçûn gunda û li dibistana li gor plana ji dayîkbûna kurikan, min ew aşî dikirin. Carcaran jî ji bo kurikên nehatibûn dibistanê, em diçûn malan.

Rojekê di germa havînê de em çûn gundê Kelhasan. Kelhasan gundekî mezin bû. Şoferê me got, mirovên vî gundî şer û hinga hez dikin. Rojên dawîya dibistanê bûn. Me li dibistanê

kurik aşî kirin. Karê me piştî nîvro xelas bû. Mamostekî dibistanê em ji bo xwarina nîvro dawetî mala xwe kiribûn. Me paşê bihîst ku jina wî û cîrana wan nanê sêlê lêdixistine û xeber dayîne wan ku ji bo me xwarinekê amade bikin. Em rabûn bi ereba me, çûn mala mamoste, ew jî kurd bû, kesekî dilpak û ezîz bû.

Xwarin li ser çardaxê hatibû raxistin. Em li ser xalîyekî bi destan hatî çêkirin li ser balîfan rûniştin. Bîhna nanê sêlê dabû dinyayê, katme, mastê pêz, dew, pil— pincarê baxçe malê, hêkên bi rûnê safî hatibû qewirandin, sofrâ me xemilandibûn. Xûdanê malê û me bi kêfekî xwarina xwe xelas kir. Katmê balcana pir xweş bûn, bi mastê pêz tahma wan ez serxoş kiribûm. Min pirsî “kê ev katme çêkirin? Pir xweş bûne destê wê sax bin”. Jina mamoste got: “Cîrana min, Fodilê ew çêkirin, ew li tandirê li ber agir e û hîn jî nanê sêlê lêdixe.” Mamoste got: “Eger tu bixwazî em herin cem wê hevdu nas bikin.” Em jin rabûn çûn tandirê. Me silav da Fodilê û wê jî em xêrhatî kirin û em li nêzî wê rûniştin. Min mêla xwe da ku çing nên lê

dixe. Di nav hêvîr û agirê tandirê de wek şervanekê kar dikir. Me sohbeta xwe tîr kir. Mêran li ser çardaxê çaya xwe bi dûmanê tûtînê ve xweş dikirin, ji me re jî çay hat. Fodilê ji me re bi zimanê xwe kilamek sira. Me fahm nedikir, lê ew melodî di jiyana min de qet ji guhê min derneket. Behsa êş û xeribîyê dikir. Mêrê Fodilê çend sal ber vê çûbû Swisreyê û li wir bi jineka Swisrî re zewicîye û lavê xwe yê mezin jî biribû ba xwe. Ne xet û ne jî xeber hebûne ji wî. Carcara lavê wê jê re pere dişandine. Fodilê ji min pirsî, ka ez zewicî me, yan na. Min got “Na! ez nezewicîme”. “Tu, bibe bûka min, lawê min li Avrûpayê, resmê lawê min heye”. Ji nişka va rabû ser xwe û berva derî çû. Me li çavên hevdu mêze kir. Çend deqa bi şûnda vegeerî hat ku di destê wê de resmê lawê xwe heye. Dirêjî mi kir. Xortekî xweşik li kêlaka avê rûniştibû. Cil û bergên wî pir paqij û modern bûn. Min got “Xwedê bibaxşîne te û malbata te”. Fodilê bi zimanekî kêrmanî dizanî got: “Tu bêje erê ez telefonî wî bikim ma were, ez a destên te tijî bazing bi-

kim. Gerdanê te yê sipî bi zêrên sedî bixemilînim. Kembera zêrinî bi nava te dim. T’a herî Avrûpa.”

Fodilê bi dilêkî germ rasterast ez ji lawê xwe re xastim. Lê nedibû!

Wê rojê ez gelek kêfxweş kiribûm. Çend caran Fodil û jina mamoste li nexweşxanê hatin ba min. Heval û dostên hêja bûn.

Gundek hebû navê xwe nehat bîra min. Li jêr Kelhasan bû. Li wî gundî me rojekê kurik aşî dikirin. Karê me xelas bû û mixtarê gund em birin mala xwe û ji me re çay amade kiribûn. Dema me çay vedixwar ji nişka va dengê şînê hat. Mixtar bi kelecaneke derket derva û me jî da dû û em beziyan berve malê çûn. Çend jinan li ber malê şîn dikirin û hembêza yekê de jî kurikek hebû. Hat fahm kirin ku kurik miriye û jinên malbatê jî şînê dikan. Jinan şîn dikirin û bi kurdî kilam digotin. Cara yekem bû min dît ku jinan porê xwe dirûçkandin û li xwe dixistin, bi rastî tirsîyam jî.

Mixtar got “Hemşîrê Xanim, kerema xwe mêze ke ka kurik çir bûye, ma şoferê te arebê bîne em bibin qezê.” Min çentê xwe girt ku bi alîkarîya mixtêr li ku-

rik mêze kim. Kurik li ser cilekê dirêj kirin. Wê demê gundî hîn jî zêde bûn li ber malê. Min qet fahm nedikir, lê êş pir giran bû. Çend mêran jî dor û paş me ferah kirin. Min cilên wî derxistin, dema guh da dilê wî, fahm kir ku ew nemirîye. Ew bîrva çûye. Min ew kir hembêza xwe û devê wî bi tilîya xwe vekir ku ma nefesa xwe zêde heyne. Ez rabûm ser xwe û dengê bilind qirîm “Ew nemirîye, ji min re avê bînin”. Av hat min serê wî bi avê şuşt û hat xwe, çavên xwe vekirin. Tirs min çêbû ku mejîyê wî bê nefes mayîbe. Min got “Bi lêz bin, em bibin nexwaşxana me.” Ereba amade bû û dayik û xalikê kurik jî sîyar bûn, me kurik gîhande doxtir. Kontrol hatin kirin, derman hatin dayîn, kurik hat xwe. Doxtirê me got “Gereg e ew kurik li nexwaşxaneka mezin were kontrolkirin. Xuya ye ku xwîna wî de pirs heye.” Bi çend ereban gundî hatibûn û li ber nexwaşxanê çav dikirin. Min mixtar agahdar kir û malbatê kurikê xwe bir Konyayê. Dermankirina wî demekê berdewam kir. Cara yekem bû min bi kurdî şîn

bihîstibû. Êş û nalîna jinan cûda bû. Dengê bi êş, nalîneka wek ji bîreka kûr de tê bû. Carcaran ji bo nexweşa malbat digirîyan lê, şîn ne girî bû. Serhildan bû. Bi rastî dilê min pir zîz bûbû.

Li dawîyê ji te re behsa tişteki jiyana min xerab kirî bikim. Naxwazim tu pê bêşî lê pir dixwazim, min bibore! Rojekê xortekî bi kelecaneke mezin jinek anî nexwaşxanê. Êşa wê pir bû. Qirîna wê di nexwaşxanê de belav dibû. Wê tirkî nedizani, xort got ew dayîka min e, ji me re tercûmanî dikir. Doxtir lê mêze kir û min ji bo êşa wê kêmbibe derzîyek lêxist. Me karê xwe xelas kir û doxtir xwest ku wê bibin nexweşxaneyeka mezin. Me ew kir ambûlansê û şand Konyayê.

Çend roj derbas bûn, ew xort hat ba me û ji me re wek dîyarî şîranî anîbû. Spasîya xwe kir ku me li dayîka wî baş û bi biryareka rast ew şandiye Konyayê. Dayîka wî amêlîyat kirine û rewşa wê jî baş bûye. Me demekê sohbet kir. Xortekî çeleng bû, bi bejn, simbêlqeytan û ji xwe bawer. Xatirê xwe xast û çû. Çend roj derbas bûn, dayîka xwe ji bo

kontrola doxtir anî. Min, ew derman kir. Dema min ew derman dîkir, wî jî ji min re tercûmanî dîkir. Ev hatin çûyîna wan çend caran berdewam kir. Lê qet çav ji çavên min dûr nedixistin. Kêfa min jî jê wî ra dihat bi rastî. Lê ez ditirsîyam jî. Bi hatin çûyîna wî di navbera me de hevaltîyek çêbû.

Çend hefte derbas bûn, em çend kes dawetî daweteka malbata xwe kirin. Ereba xwe hebû hat em ji qezê girtin û ajot. Em berve Gola Xwê çûn. Gundekî mezin bû. Dema em gehîştin ber malan ro diçû ava. Dengê dol û zîrnê li ewr belav dibû û keç û xortan govend girtibûn. Li ber dîwarê malê li ser balîfên xalînî em rûniştin. Dewlemendîyeka mezin bû. Li kêleka Gola Xwê, li deşta Cîhanbeylîyê di nav çandeka gelekî cûda de bûm û kêfa min di cîh de bû. Çay, av û dew hat belavkirin. Kesên min û hevalên min nas dîkirin dihatin û em xêrhatin dîkirin. Govenda ciwana pir xweşik bû. Xort û keçan bi hev re govend girtibûn. Cil û bergên keçikan pir xweşik bûn. Şalberên bi rengîn û gul û

gulbend. Jinên zewicî li serên wan şarpe hebûn. Keçikên li dervayî gund dijîn serqot bûn. Dema min pirsî, gotin ew li zanîngehê şagirt in. Kultura klasîk û ya nûjen li ba hev bû.

Demekê bi şunda em jî rakin dîlanê, lê min qet ji govendê fahm nedikir. Ew hat ket destê min. Tilîyên me yên kereqûçê bi hev girtin. Destên me bi kelecane şil bûn. Dixwast ez hînî govendê bibim. Çend dora çex bûnî. Sê gav pêşda gavek jî paşda diçû govend.

Me govend berda û ji bo xwarinê derbasî malê bûn. Oda em lê bi xalî û balîfên dîwaran hatibû xemilandin. Em li ser mînderan rûniştin. Ji me re nan hat danîn. Li sifreka ser erdê xwarin hat amadekirin. Keçik û xortên malê xizmeta me dîkirin. Ew bi xwe jî bi me re rûnişt, lê ji bo kêmasî nebin, her dem xort û qîz agahdar dîkir. Siftê şorbe hat, dûre jî goşt, zad, selete, zeweş, xoşav, nanê ser sêlê. Kultureka cûda û rind. Gelek kêfa min jê ra hat. Ji xwarinê bi şunda em dîsa derbasî bermalê kirin. Însan pir zêde bûbûn. Bi hezaran însan

hatibûn dawetê. Çavê wî di çavên min de bûn. Ji ber wê min fedî jî dikir. Ciwanên gund, dema dev ji govendê berdidan bi muzîkê re li meydanê bi ben/kêndiran li hev dixistin. Ev bi tirs jî bû. Hevdu dêşandin. Min pirsî, ka ev çi şênahî ye? Gotin: “ture ye”. Ture, edeteka kevnare ya kurdan bûye. Şênayî heta nîvê şevê ajot. Wek mêvan gelek qedr û qîmet dane me.

Nîvê şevê wî dîsa em bi ereba xwe gîhandin Cîhanbeylîyê. Me heval li mala wan belav kirin bi şunve, diviya ku ez bibirama lojmana min. Erebe di nav qezê de giran giran dajot. Dixwest bi min re hîn zêde demê derbas bike. Lê, min got: “Nîvê şevê û

sibe karê min heye.” Dema em gehiştin ber derîyê min. Min sipasî wî kir û xwast ji erebê peya bim û bi destê min girt û gote min; “Ez aşiqê te bûm.” Min qet dengê xwe nekir û peya bûm û li ber ronahîya lambên erebê ketim hundirê malê û min derî girt.

Kelecanek ket dilê min. Min heta îro qet ji kesekî ji bo êvîndarîyê tu tişt nebihîstibû. Dilê min giran bû, min xwe amade kir û ketim cîhê xwe, lê qet çavên min nehatin hev. Gotina wî dil û mejîyê min kiribû bin bandora xwe. Di nav xeyal û xewnan da bi zengilê saeta xwe ji xewê rabûm.

(Berdewamî hêye)



Bisk û gulî

— 1 —

Mehtap Îdelî

Por

Her çend wekî parçeyek ji laşê mirovan xuya bike jî, di gelek çandan de xwedîyê wateyên pir kûr e. Wekî jinitî, bedewî, dilkêşî, hêz, ciwanî, zindîtî û heta heta pîrozî. Û bi hezaran salan jî di civakan de bi gelek simbol û aksesuwaran girîngîya xwe parastîye. Aksesuwar û şêklên ku di demên kevnar de ji bo por dihatin bikaranîn, di der-

barê rewşa wan ya civakî, statû, olî, sîyasî û zewacê de agahî didan. Her çiqas ev rewş ne wekî berê be jî, dîsa jî li hin cîhan vê taybetmendîya xwe diparêze.

Di nava civaka kurdan da jî ev rewş, heman bi vî rengî ye. Ew aksesuwar û şêklên por, go-ra dem, temen, ol, civak û rewşa wan dihatin guhartin. Her yek

sembolên tiştêkî bûn û her yekê zayenda wan dîyar dikirin. Jin û keçik bi bisk û gulî, bi kitan û kofiyên xwe. Mêr û xort, bi kofî û kulîk, bi perçem û temeliyên xwe dihatin zanîn. Bisk, gulî, kofî, kitan ji bo bedewîyê dibûn xemla keç û jinan. Ji bo ku xweşik bibin, wan serên xwe bi aksesuwarên cuda dixemilandin û porên xwe jî cuda cuda dibirrîn û şikil didan. Ji van yek jî “Biskbirrîn” bû. Hen keç û jinan, ji bo hîn xweşiktirbûnê,



pêşîya porên xwe jî porê din hinekî kurttir dibirrîn. Û ji vê yekê ra jî digotin “**Bisk**”. Bisk ji wan ra bûbû terzeke cuda. Piştî birrîna bisk, ew bi dorê de dihatin berdan. Pîrika min jî biskên xwe dikirin du parçe. Parçê paşîyê bi pêşîya guhên xwe de berdida, ya pêşî jî diavêt paşîya guhên xwe. Bi vi awayî porê wê him xweş xuya dikir û him jî bi ser çavên wê de nedihate xwarê. Hinekan jî ji bo ma nekevin ser çavan porê xwe çit (toqe) dikirin. Carna jî dikirin kezî û di bin kofiyên xwe da girêdidan.

Biskbirrîn

Biskbirrîn, li Anatolîya Navîn de hê jî di wateyake din de xwe diparêze. Bisikbirrîn seremonîya bidergîstîkirina zarokan a di temenê gelek biçûk de ye. Carna piştî xwedîdayîna zarokan, yek caran jî bêrî hatina dinyayê ya

zarokan, kal û pîr û dê û bavên keçîkê û yên lêwîk bi rêya biskbirrînê soza zewaca wan ya di temenê gihîştî da didin hev.

Dema ew keçik û lawîk mezin bûn, bixwazin an jî nex-

wazin mecbûr dizewicîn. Ew adet heta derengî berdewam kiribe jî êdî mîna gelek adetên kevn wenda bûye.

Biskbirîn, di çanda êzîdîyan de jî bi wateyake din xwe nîşan dide. Kurdên êzîdî sermenonîya yekemîn porbirîna zarokan wekî biskbirrîn bi nav dikin. Wekî vaftîzê ye û Şêxê biskbirrînê heye. Şêx dua dike û biskên zarokan dibirre.

Biskbirrîn, her çiqas di adetên kurdan de bi wateyên cûda hatiye bikaranîn jî, di dawîyê da hemû di por birrînê de digihîjin hev.

Kofi

Kofi li Kurdistanê bi hezaran salan wekî aksesuwara jinan tê bikaranîn. Derdora kofiyan bi hebên zêr û zîvan û bi morî û mircanan dihatin xemilandin. Hejmara zêr û zîvan li gora rewşa malbatan dihat guhartin. Hinek kofi bi 24 zêran dihat xemilandin, hinek jî ji vê hejmarê kêma zêde bûn. Xeml û motifên ku li ser kofiyan dihatin çêkirin ji rewşa wan ya zewacê û nîşana malbat û eşîretan didan zanîn. Her yek ji hev cuda bûn. Ji xemla kofiyan wan dihat zanîn ku ka kî jin e, kî keçikeka ciwan e an jî kî dergîstî ye. Li hin herêman jî keçik bi dergîstî bûn şunda, dibûn xwedî kofi. Kofi hê li hin herêman hebin jî, her ku dem derbas dibê, şûna xwe ji kitan û şerpan ra dihele. Jinan bi piranî kitanên spî didan serên xwe, bi ser da şarên reş û temezî didan ber enîya xwe. Jinên ciwan jî tenê şerpe didan serên xwe û ew bi awayêkî cuda girêdidan.

Gulî

Şiklê din ê ku li pora tê dayîn jî gulî ye. Gulî, di çanda kurdan de herwiha wekî civakên din de jî,



xemlandineke keç û jinan ya girîng e. Keç û jinên kurdan berê porên xwe dikirin gulî, bi piranî jî çelgulî. Dûra ew bi ben û perçeyên qumaşan, zêr û zîvan, bi morî û mircanan dixemilandin. Bi vê yekê gulî xweşik xuya dikirin. Ji aliyê din ve jî bi gulîkirina por, jiyana wan a rojanê jî hêsan dibû. Keç û jin dihatin navbereke û bi alîkariya dê, xûşk, heval û cîranan porên hevdu diûlîn û dikirin çelgulî. Ji bo çelgulîyan, siftê porê xwe ji serî heta binî, bi şeyê hestî yê devzirav ducar dikirin. Wan bi vê xêza ku di navbera pora da

çêdibe ra jî digotin, “rastik”. Dûra yek ji wan parçeyan diavêtin ber milê xwe, parçeya mayî dîsa dikirin bîst par û yek bi yek diûlîn. Ji hêla din va jî bi ev por yek bi yek diûlîn dikirin bîstgûlî. Carina jî ben û perçeyên hûrkiirî yên qumaşên rengîn dikirin navbera por û bi hev ra diûlîn. Serên gulîyan jî zêr, zîv, toqaz (gulik), morî û mircan pêve dikirin. Dûra hemû gulî ji kêlekê de bi benekî bi reng berepaş, ji hêlekê heta hêla din dihat ûlandin ku ma gulî belav nebin. Ji vê girêdanê ra jî digotin, „çatqi”. Gulîya çatqibûyî, him belav nedibû, bi ser çavên wan da nedihat û him jî hemû gulî li navberekê xweş xuya dikirin. Keçikan gulîyên xwe diûlîn şûnva diketin rêzê û bi kefxweşî diçûn ser avê, xort li dora kanî û bîran dibûn teyrên bê bask.

Dil ketine keç û xortan li van deran dest pê dikir. Her kesî evîndara xwe ji xwe ra belî dikir û bi îşmaran dilê xwe ji hev ra digotin. Keçan, sohbet û şahî xelas bû şûnva li vegerê kûzên (şerbik) avê ji bo ku ma gêrnebin (nekevin) bi gulîyên xwe ve girêdidan, didan ser milên xwe û bi kefxweşî dihatin malê.

Elbet divê em dahol (dawet) û şahîyan jî ji bîr nekin. Xemilandina gulîyên keç û jinan ya herî taybet li wan şahîyan dibû. Wan por û gulîyên xwe bi aksesuwarên bi qîmet dixemilandin, kinc û kolên xwe yên herî xweşik li xwe dikirin, koftî û şarpe li serên xwe girêdidan diçûn dawet û şahîya. Xemlandinên kinc û gulîyên wan mîna ala Kurdistanê ya rengîn xuya dikirin. Xort di dora keçî-





kan ra dibûn aşê bayê, keç jî bi vê yekê kêfxweş dibûn. Dûra kom bi kom direqisîn û govend dikşandin.

Ew hejmara gulîyan gora rewş û demê dihat guhartin. Dema di malbatê de şînek bibûya, ew hejmar dibû gulîyek. Yanê çelgulî xeml û nîşana şahîyê, yekgulî jî ya şînê bû. Her ku dem çû, ew kêf jî çû pê ra hejmara gulîyan jî kêmbû. Pîran, du an— çar gulî diûlan û bi dor xwe da berdidan, an jî bi hev da girêdidan, keç û jin jî heta yek— du gulîyan daketin.

Mixabin gulî ji bo kurdan ne tenê bedewî bû. Gulî sembola nîrx e ku ji jinan ra hatiye dayîn. Ya wekî şerpa jinan giranbûha û tiştê ku dest lê nayê danîn. Gava di nav kurdan de pevçûn çêdibû, jina mêrkanî dihat û şerpa xwe diavêt navberê û mêran pevçûn xelas dikirin û belav dibûn.

Gulî carna jî dibû sembola evînê. Dema keçek û xortekî ji hev hez bikirana, keçikê gulîyê xwe dibirî û dida evîndarê xwe. Wekî ku bêje “êdî ez ya te me”. Ew dibû sembola evînê û soza wan ya ku dabûn hev. Lawik ew gulî heta dizewicîn, fikir nav simala (destmal) xwe û di paşila xwe da vedişart, bi dizî bîhn dikir û li ser kilam û lorîk distiran.

Gulî, kezî û bisk pir caran dibûne îlhama stran û helbestan jî.

Biroyê Tîto bi Dîlbera Wekîl va di radyoya Erîvanê da strana “kezîzer” bi awazeka zelal, bi dorûdor ji hemû kurdan ra distran:

Kezîzerê kezîzer, kezîzerê kezîzer

Kezîzerê kezîzer, yeman yeman kezîzer

Tu ji govendê were der, kezîzerê kezîzer

Tu ji govendê were der, yeman yeman kezîzer

Te ra bejim yek xeber, kezîzerê kezîzer

Te ra bejim yek xeber yeman yeman kezîzer...

Dema evîndar nedigihîştin hev jî, wê demê evîna wan dibû destan. Wan evîndaran, li ser evîn û miradê xwe yê neçûyî serî, dilorandin û kilam distran. Ew kilam û lorîkên evîndaran, ji dengbêjan ra dibûn îlham û heta roja îro jî tên strandin. Wekî Mem û Zîn û Xecê û Sîyabend. Li Anatolîya Navîn jî kilam û stranên li ser evînîn ku negihîştin miradê xwe hene. Yek ji wan jî kilama evîna keçîka etmanî û elegçî ye. Li gundekî Enqerê dilên keçîka axa Êm û yê lawîkê elegçî, yê ku hatî gund

eleg û bêjîngan çêdike dikevin hev. Lê yê derûdor çî dikin nakin, nikarin wan ji vê evînê vegehrînin. Dayika Êmê mês dike ku rewş ne baş e, bi çend jinên cîranan ve bi dizî dihere elegçîyan tehdît dike û ji gund dişîne. Êm sibê radibe ku kon tunene, meselê fam dike û ar (agir) bi dilê wê dikeve. Dihere ba etka xwe, lome û gazinên xwe dike û digirî. Dayika wê jî ji bo ku dilê wê xweş bike, bi gotinên xweş keçîka xwe şîret dike. Li ser vê yekê ev kilam derdikeve holê:

Bar ke bar ke elegçîyo bar ke
Kurtin dayne ker tîmar ke
Etê kwîr bûyê zû ke serê min bişo
Gulîyên min bi çarmar ke
Min bi lawkê elegçîyan ra bi heval ke
Min bi lawkê elegçîyan va zû bi rêke
Emê, mala bavê te yê xanedan e
Qonaxa bavê te yê bi heyşt dîregan e
Xudanê heft şivana, kerîyê pezan e
Tu xemilîyî bi zêr û zîvan e
Li te nakeve lawîkê elegçîyan e
Here Êmê poz bi xezemê
Tu pê çîkî bi lawîkê elegçîyanî nesîb kême
Etê malê dinê li dinê bimîne
Ma bişewite qonaxê bi heyşt dîregan e
Ma qîran bikeve kerîye bi heft şivana
Çavê min tine li axa û began e
Dîsa derdê dilê min jî lawkê elegçîyan e...



Etika Emê û meri û meristan
 çi dikin, nakin nikarin li ber dilê
 Emê dayîn, ne jî dikarin umêd û
 xwezîyên di dilê wê de bişkînin.
 Emê jî xwezîyên xwe wekî Arjen
 Arî kiribûn Qîzika Çilkezî. Bi
 şev dihûnîn, bi roj şeh dikirin. Û
 destana xwe jî wekî destanên din
 bi dawî kir û çû.

Gulî carna jî dibû mesela
 namûsê. Heger keçek nexwaze
 bi lawik ra bizewice, an jî mal-
 bat razî nebe, lawik dihat bi dizî
 gulîyên keçikê dibirrîn. Êdî ew
 dibû mesela namûsê û ew keçik
 mecbûr bi wî lawikî ra dihat
 zewicandin. Yekcaran jî ji ber vê

şer û pevçûnên mezin çêdibûn û
 meriv dihatin kuştin.

Carna jî keçika bêdil, bi
 gulîyan ve kaş dikirin û direvan-
 din. Qebûl bike an jî neke êdî
 ferq nedikir, ew mecbûr dima û
 dizewicî.

Gulî carna jî dibû tehdît.
 Di meselên di navbera malba-
 tan de gulî wekî tehdît jî dihatin
 bikaranîn. Jinan bi jinan ra an jî
 mêran bi jinan re bigota “em ê
 gulîyên te bibirrîn”, ev yek dibû
 sedema şer û pevçûnên mezin û bi
 kuştin û dijminatîya giran bi en-
 cam dibû.

Dema di malbatê ji kesekî pir

bihata hezkirin, an jî kesekî ciwan bimiraya, wekî bav û bira, jin û keçên malbatê por û biskên xwe diruçekandin û gulîyên xwe bi kêran dibirrîn û binax dikirin. Ew edet hîn jî li ba kurdên êzîdî berdewam e.

Jinên êzîdî, dema ku mêrên wan dimirin, gulîyên xwe dibirrîn û bi serê kevirên gorê girêdidin. Bêpormayîn ji bo jina êzîdî pir bi êş be jî, ew porên xwe, ji bo êş û xema di dilê xwe ya bêdawî, feda dikin. Ew kirin jî ji bo wan tê vê wateyê: “Min di jiyana xwe da êşek ji vê mezintir neditîye. Bi te ra jinbûn û bedewîya xwe binax dikim û derîyên jiyana xwe digirim”. Yanî ew jin êdî dibe mirîyek zindî. Ji alîyê din ve jî, bi vê yekê xurtbûna têkilîyên malbatî jî nîşan didin. Ji jina ku porê xwe birrî û şînê digire ra dibêjin “**por-kur**” “**kezîkur**” an jî “**gulîkur**”. Herweha gotina “porkur” wekî nifir jî tê bikaranîn.

Gulî herwiha ji bo keç û jinên êzîdî bûbû berxwedana li hemberî hovîtîya Daişê jî. Keçên êzîdî di karesatê de, di serhildanekê de, yan jî gava li kesekî pir li hêrs bikevin, porê xwe ji kok de dibirrin . Tê go-

tin, piştî dagirkirina Şengalê ya ji alîyê Daişê ve, di bin her keviran da bi sedan gulîyên kêçên êzîdî hatine dîtin. Ew gulîyan bûbûn serhildana wan ya dijî Daişê.

Gulî carna jî dibû, sirra li ber derîyê jêrzmîna şewitî ya li Cizirê. Sirra ku li ser kevir belav bûye û bêxwedî.

Û carna jî dibû qîrîna di nav agirê gundên şewitandî yên ku xof xistîye dile dijmin...

*Porkurê

Çil roj piştî şînê dîsa qîrîn bi dengê wî yê bêar diket.

Were

Were

*Tilîyên xwe bike şûrên şamê
Porê min ta bi ta talan bike*

Were

Bila porkura vî bajarî ez bim

Were

Gulîzer

Çavkanî: Mem Xelîkan, Elegçî, Bîrnebûn, Hejmar 82, rûp 16– 17
Wêne li sosyal medya hatine wergirtin.

Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mêjo vekirî ye.

Seyfî Doğan

du kurd
çar partî
bijî

dizî xumal e
yan zerar
wîqas nedibû

odên malên kurdan
pençere xwe
yeka tenê ye

keriyek pezî
ketiyê kûyê
mala minê

sîyasetmedar li sehnê
kincên xwe
gelek caran digûherin

bextewarîya nezanîyê
heza bêpersîyar
revîtîya rûberî

crea diem
carpe diem
bixwe evîne û razê

bi asansorê
herê
ezmên

rêvîtiyên
bêhedef
dilteng dike

bayî biharê
pelên payîzên hîşk
firandin

dilsoziyên
dosta
enerjiya bêdawî

berfînan serhilda
berf helîya
itifaq

rêvîtiya hundirîn
hiş
fehm kirin

rêvîtiya hundirîn
dialog
behşandin

avê li didane
biharê dihilîzê
aşîkar

têmpo yê bi lez
insanên bi bez
jîyana bêreng

parsekçî
bes pere nexwazin
empatî



Bi dayika min Zêza Zewê Silê Atê va li ser biwêjan:

„Bi ro da çûyîn”

Wehîde Memkê Hesê Mihe

Min ev bivêja li jor, cara yekemîn ji dayika xwe bihîst û pir bala min kişand. Min tavi lê not kir. Lê ya ku dayika min li ser vê biwêjê dizane, ji min ra girîng bû. Min dixwest rojekê ji wê pirs bikim. Lê derfet çênebû. Çend wext in li fersendekê digerîyam. Sal çûn, sal hatin û ew derfeta ke-te destê min.

Ji deman havîn bû. Dayika min, ji bo çend mehan hatibû mala me mêvanîyê. Li derve germahîyek bêhempa hebû. Çi dikete ber rojê germ dikir. Nîvro şûnda ez ji kar hatim. Weke her carê me xwarina xwe xwar. Xwarin ji hêla dayika min ve hatibû pijandin. Het niha jî min hê xwarina wê rojê ji bîr nekirîye. Çimkî

tam hîn li ser zimanî min e. Bi ser wê xwarinê va çi bixwim û çi vexvim, ew tam ji devê min nare.

Dûv ra me xwast, em çaya xwe li ber derî malê vexwin.

Êyam î xweş e. Roj tîna xwe hîn bi camêrî belav dike. Em derketin ber derî û rûniştin. Çaya me hat. Xanimê bi me ra qedexek vexwar û şûnda çû hundir.

vegerî, bigerî dawîya jiyane mirin e.“ Kî dizane, rojekê ger law bixwaze dengê dayikê bibihîze, ew ê telefonê veke û guh bi serde.

Bila di vê navberê de, ez parantezekê vekim û hebkî qala dayika xwe bikim:

Ji ber ku herdem fersend nakeve dest mirovan. Dayika min li gundê Pizbenga hatiye dinê.



ZEZA ZEVÊ SILÎ ATE EZ BI BRAZÎYE XWE BERZAN Û LAWE MIN TAMO

Em bi tenê hîştin daku law û dê bikaribin bi kêf sohbetê bikin. Min tîlefona xwe ya destan danî ser masê û dest pê kir û dengê wê tomar kir. Me ji alîyekê da çay vedixwar û alîyekê da jî gotûbêj dikir. Dayika min pêhesî deng tê qeyîdkirin, lê xwe ji wir nekir. Çiqas be jî ev tiştekê kêfweşîyê dide mirovan. „Herî, werî,

Navê gund bi tirkî Tosunburnu ye. Ji navenda bajarê Qirşehîrê bîst û pênc km dûr e. Dema îskanê, Mifîkan deh û heşt gund li vê deştê ava kirine. Yek ji wana jî Pizbeng e. Keça Mehemedî Esenê Ûse û Zeva Silê Ate ye. Xwanga sê bira ye – mixabin xaltîya min tûne– . Di jiyana xwe da neçûye dibistanê. Wê demê,



dibistan li gund tunebûye. Lê dibistan hebûya jî, dayika wê, Zevê nedihîşt ku ew here mektebê. Çimkî malbat Ocaxî ye, nedibû ku keç tev xortan biçûna mektebê.

Ji alîyekî jî ez gelek kêfxweş im ku ew neçûye dibistanê. Zêde nekim: Wê mêjo û bîranînên xwe bi „tire– vire“ya perwerdehiya tirkî xerab nekirîye, bi her awayî weke jineke kurd maye. Bi taybetmendiyên xwe ve, wek xwe maye. Helwest, tevger, sebr, evîn, rêz û hwd. herdem rastîya wê ne. Herweha bîranînên wê xurt û zelal in.

Ew hemû hûrguliyên salên borî yek bi yek dizane. Xatûnek dilsoz e. Kevneşopi di jiyana wê da cihekî girîng digire. Kî miriye, kî nexweş e, kî dizewice, kê

zarûzeç anîne dinyayê, kî bi kîjan nexweşiyê miriye, kê daweta kê da xelata zêr anîye û hwd., yek bi yek dizane. Ma kes va gotinên min bi çûk nabîne. Emrê dayika min ser heyştêyî ra ye, le heş û bîranînên wê hê jî mîna saeteke dişûxlin.

Ya herî girîng jî, wê karibû evîna “dayikbûyîne” bide zarokên xwe. Desthilatîyek wê ya mezin li ser me heye. Ez car caran nikarim ji bin vê barî rabim.

Ew oldar e, ji kî ku tê bîra min, ew nimêja xwe dike. Ji bo ku bavê min tenê nehêle, bi wî ra çû hecê jî. Bona ku min destûr nedaye, rojîyê nagire. Zanebûna olî û beşên ku wê ezber kirî tevlihevîyên derbirînên ji dayika xwe êvisîne.

Em werin ser mijara xwe.

Me dest bi sohbetê bi vî rengî kir:

Ez gundîyê me pirs dikim ev jî bersiva min dide.

– Dayê ji mala Husîn, Misto çi dike?

– Î rind e. Kêfê li şûnê ye. Bara bajêr kir, daîrek stand. Zarok dane xwendin. Lawik bû mamoste, keçik jî bû hemşîre. Tayîna lêwîk rabî alîyê Qersê, keçik jî çû nexweşxana bajarê Edîrne.

– De ê rinde.... Nezikî hev bûne! Xwangeka Misto hebû. Kezê, ew çi dike?

– Ê rinde. Bara Enqerê kir. Merkî di beledîyê da dişûxile. Kurike wê jî xwendin. Yek bû

– Xwangeka wan din hebû, nav nehata bîra min.

– Nûrê.

– Erê! Ew çû ku? Kurikê wê jî xwendin. Daîre stand?

– Bi tirkekê va zewicî. Bara Samûle kir. Pirs meke! Sala çûyî lawikê wê mir.

– Çima? Nexweş ket?

– Na! Li alîye bajarê tırka Tekirdag esker bû. Li wir „bi ro da çû!“

– Di avê da vetisî?

– Na na “bi ro da çû”.

– Ew çing tewe? Tu xêre nabejî di avê da vetisî.

– Di avê da vetisîyaba min ê bigota. Tu fehm nakî! Ketîye çem xwe tenikî biwesîne. Paşê di wir da „bi ro da çûye“.

–Aha min niha fehm kir. Tû dibejî „bi lê da ket“.

– Te hîn fehm nekir, lawê mino! Ew î ku dikevin çem û vetisîn ra em dibêjin BI RO da ÇÛ.

* * *

Di vê hevokê da „Ro“ tê çî mehnayê? Zêde li ser sekinîm. Roj e? Çimkî em kurmancên Qirşehîrê nabejin „roj“, em dibejin „ro“. A ku ez dizanim, roj dîroka me da cîhekê xwe taybetmendî jî heye. Ji Zaradostîyê da dest pê dike hetanî Êzdayetîyê diçe.

Hêla din jî pîranî kurd bi çem ra dibêjin ro. Vê alîye jî peyvên zazakî, di kurmancîya me da gelek zêde ne. Belkî ji zazakî ketibe nav zimanê me.

Kî yê bizane? Min hîn bersiv nedaye. Belkî xwendevanên Bîr-nebûnê dê bersivê bidin.

Silav û hurmet.

Helbest

Bênav

Ez her şev li tîbûna xwe
jana pêşîrên helbesta stewr bûyî
dimijim

– balîfa ber serê min
li bêxewîya janêşa şevistanên keserkêş
di gewrîya qilifa xwe de
her tim nalenal e.


– qayika xewnên şevistanên min
yê dilbirîndar
li nav pêlên okyanûsên har û dîn
noqî tofana keser û kederên bêbinî bû.

– her şev
di hembêza bêxewîya jana mirinê de
bi ferîşteyên dogehê yê sermest re
direqisim.

li koretariya şevistanan û kendalên bêbinî
siya giyanê xwe yê reben
dibinim.

Xizan Şîlan





Fata Usê

Lawikê xwe mir, dergîsta wî li tî vegerand. Li pişt pir
salan bûka xwe mir û Fatê li ser weng stira:

Min bûkeka xwe tilîlî kir
Min serî şuşt gulî kezî kir
Min bûk bir teslîma tî kir
Tî biçûk bû min fedî kir

Werne min bêkesê
Singê Cemîlê min dane ber meqesê
Yayrum tu yî bi heft yorgana yî
Çima avêtine ser te betanîya malê Silê Hesê

Kê bêtarên weng bîstine
Bûk dimire xasîyê xweş e

Berhevkar: **Altun Başaran**



KOÇBERÎ Û DENG BÊJÎ

Memduh SELÎM

Koçberî, bêwari ye, bêcihi ye, bêşûni ye. Barkirin e, bi rêyên dirêj çûyîn e. Koçberî, karê zindîya ye, karê ciwanîyê, mirî û gorn li paş xwe ci hiştin e... parvebûn e. Demeke dirêj êş, xem, xemgîni di jîyana koçberan da cihekî mezin girtîye. Dema koçberî ji bo kurdên Anatolîya qedexe bûye, dûre welat li Anatolîya Navîn bi zordestî îskanbûn e. Hemû gundên îskan bûyî perşikestî bûn, cih û warên biyanî da xerîb bûn. Wê demê çavên wana li rê ya welat qerimîn. Lê, dizanîn ku hatineke bêveger bû para wana.

Dîrokek taybet, koçberîyek dût, dirêj û bi tenê. Bi giranîya li paş mayîna deşt û zozan, ji axa dê û bavan dût ketin, emirwakî çûyîna welatê xerîb. Derîyê vegerê yî girtî, çûyîna bêveger. Bi giranîya di encamê de nezaniya, jîyan an mirin. Tevabûn, wendabûn, jibîrbûn... hemû mirin e.

Demeka dirêj ji bîrbûn û bê dengî. Bêkesî û bi tenê mayîn. Bêcih û bêwar. Lê ne stuxwar, ne wendabûyîn ne xwe jibîrkirin. Di kûr da hesreta welat, parastina zimên û çanda delal.

Stranên zîz, berhemên jana kûr û bîrnekirineke mezin. Stranên dengbilind, xebata denggihandina welêt. Stranên dirêj, hesreteke mezin. Li welatê xerîb jîyaneke diwar.

“Lo Qertelo

Tu bi xwedêkî

Hêlûna xwe ji Uzunyaylê virda çêkî

Siyarekî min î ji siyaran werê

Tu bi xwedêkî peya bi rê neki”



Mestê Elê, dema dest bi vê kilamê dikir, bi dengekî zîz, dengekî zêlal û bilind, bêdengîyê jî dest pê dikir û guhdarên li dor, careke din diketin bîrên kûr û tarî, di ber çavan re derbas dibûn xeyalên deşt û zozanên welêt, carekê jî hildikiştin bilindîyên çîyan bi hêviya welat dîtîne. Dengê Mestê, gotinên Mestê, zaraveyê stranê, barên li ser milên koçberan, xerîbîya koçberan sivik dikir, ji wan ra hevalî dikir. Ji bo wê jî dengbêjî ji derd û kûlên koçbera ra defer bû, xevn û xeyal bû.

Ji ber ku dengbêjî û şaretî bi qîmet bû di nav koçberan da. Di warên xerîb de ji wan ra heval bû, dost bû. Demek dihat dengbêjan stranên/kilamên jana koçberîyê, demek dihat stranên şînan, demek dihat stranên govendê distiran... stranên evîne jî cihekî girîng digirtin, di jîyanê da.

Xêca Şemê, jineka bedew û bejndirej bû, di nav civatê de, ji bo cihêkî taybet mafdar bû. Li şînekê an li dawetekê, giranîya serdana, rûniştin û rabûnê, di cih de dengkirin gelekî baş dizanî. Denbêjeke/şareke navdar bû. Li herêma/war herkesî nas dikir û şaretîya wê dizanî. Jineka pişt baza rojên reş bû. Xwedana dengekî zîz û zirav bû, dengxweş bû, xwedana dilekî pir xemgîn û şewat bû. Lê mixabin bêbext bû, jîyaneke bextreş ketibû para wê.

Du xûşk û birayên wê bêwext koça dawî kiribûn. Ji bo wê jî stranên wê ji kûrahîya dil dihatin. Bi dengê kelgirî. Dema kilamên şîna distiran li dor wê kî heye herkes bi hestên wê dijîya, bi wê ra diêşîya, bi wê ra digirîya. Di nav civata şîne de dest pê dikir:

“Careka din narim ser mezalan

Mêze nakim tirba du xezalan

Arê kezeba min mepirsin

Ê di bin axa sar da ramedî

Recalê mala bavê min e”

Apê Xêcîyê Şemê, merivekî bejndirêj û li ser xwe bû. Giran bi rê diçû û giran giran deng dikir. Govend baş digerland, ser govend bû. Dema govend dikişand, te hez dikir lê temaşekî, keçik û xort mat dibûn, mêla xwe baş didan wî bi balkêşî govenda wî sêr dikirin. Govend çawa dikişand? Apê Xêcî, ji bo çanda folklorê kurdên heremê mînak bû, mînakekî herî baş bû. Li wê demê gundên Anatolya Navîn dema karê payîzê xelas dibûn, dema dawetan dihat.

Dema dawetên gund dest pê dikir, çavên xwedî û serdanên dawetan li Apê Xêcî digêrîn. Herkesî dizanî ku Apê Xêcî heye û hatiye, ew daweta e şên bibe, govendeka baş a were kişandin, dilşahî ya çêbibe. Wê demê dawet li dawîya xerman berhevkerinê dest pê dikirin. Apê Xêcî dikete serî govendê, desmal di destê rastê de giran giran govend dikişand. Dema govend dikişand bejna xwe dîk digirt, şewkê li sêrî, destê rastê de desmal ba dikir û bi alîyê rastê de gavên xwe diavetin. Di govendê da gavavitin, desmalgirtin, ba kirin û bejna wî wek wêneyekî xuya dikir, govendkişandina Apê Xêcî tevî hunerî bû. Meriv difikire, Apê Xêcî nebe, govend bêxwedî bima. Dema meriv govenda Apê Xêcî temaşê dikir, tengasîyên jîyanê, kar û barên dinê ji bîr dikirin, govenda wî, her derd û kul bi bîrkirin didan. Bi dengê giran, gavavetina hunerî dest pê dikir;

*“Tew tew lewendê
Sîng gewrê balgê zendê
Sewa xatirê te rindê
Ketime serê govendê”*

Salên 1960, 1970 bûn. Serma zivistanê şeveke tarî dîsa stuxwar bû, xemgîn bû Milomer. Ji alîyê evîna bê bersîv, evîna dilşikestî, miradê ku neçûyî serî. Bi kelgirî dîsa dest pê kir;

*“Careka din narim ser ettaran
Bazar nakim tîştî yaran
Balê xwe nadim bazing û guharan”*

Milomer evîna xwe, di şeva zivistana sar û tarî da bi dengeki zîz û bilind diqirî... radiperî/radigerî. Nizanim dilgirtîya wî ew dibihist an nedibihîst.

Evînên hezkirî û dildaran jî, bi êş û jana koçberîyê ve tev dimeşî. Mîna kilama Hesê Laz e.

“Wenda wenda Hese Lazî mino wenda
Gul û sosina bi hev ra reng da
Malê me yê êwirîn e li Qeregullê cîyekî teng da
Xwedê dil miradê min û te bikira
Şevêkê ji şevên zivistanê
Min bejna xwe bi rû bejna lawkê çeleng da”

Zêwa Gulê, li ciwanîya xwe dildara/evindara Hesê Mîrcê bû. Dilê Hesê Mîrcê jî li Zewa Gulê bû. Herdu ji hev gelekî hez dikirin. Lê ji bo pirsgirîkên malbatan dilê wana cih nedî, negihîştin ber miradê xwe. Qedereke reş bû para wana.

Cûda cûda bûne mehkûmê zewacek bêdil. Jîyan didome, gelekî sal derbas dibûn, zar û zêçê wana mezin bûn û ewna herdu ji kal û pîr bûn. Rojekê xort û qîzan qala dil û evîndarîyê dikirin û fikirên Zêwa Gulê pirsin. Zêwa Gulê bi kezêba şewitî, gotina dawî digot:

“Axx
Heta ku nebêjim Hesê Mîrcê,
Arê kezêba mîn danêyê.”

HELBEST



duh xewn bû
demek bû û li ber çavên me helîya
hafîzê me biranîne cîwan berhev kirin

îro jîyana rast e
roj û qederê xwe xûliqandin
di dest me da ye

li ser rê gelek astengî hene
ruh û can wek bîrayên dijmin in
berxedan û rev ê mimkûn e

sibê utopîyayê
leylanên li doralîş me da revîtîyê bikin
mirov dikane kur anjî rûbarî dinê temaşa bike
hevîyên rojên û şevên bixemilînin

li kevîyên çemên qamişên qulên li ziravî bûkê xin
hespên simên pêşîyê ji zer û yên paşîyê ji zîv
ê erebê bûkê bikşînin

Seyfi Doğan

Xwe şaş neke

Riya Kadizê ye riya te,
xwe şaş neke
Ya ku hîvê jî ronî dike
Roj bi xwe ye
Ez çi bêjim çi nebêjim,
ne yek e, ne dido ye
Divê pêşî mijarek hebe,
bingehêk hebe, navek hebe
Dibe ez navê wî karwanî nizanibim
lê serkêşa karwan ez bi xwe me
Ne stûxwara gulaberroj im,
ez li hêvîya tîna te me
Xwe şaş neke.

Asya Xerzan

Asya Xerzan, di sala 1974an de, ji malbateke kurd a êzdî, li herêma Xerzan, li gundê Qorixê girêdayî navçeya Qubîna Batmanê ji dêya xwe bû.

Dibistana destpêkê li Qorixê xwend, dibistana navendî li Obernkirchen Almanyayê xwend.

Asya Xerzan, sala 2016an di 24mîn Pêşbirka Wêje û Helbesta Kurdî ya Huseyîn Celebî de xelata yekemîn wergirt. Asya dêya sê kura ye û ji sala 1985an ve li Almanyayê dijî û endamê PENa kurd e.

Berhemên wê:

Dengê Bêdengîyê – Helbest Weşana Sîtav / 2016 / Wan

Dengê Bêdengîyê – Helbest / Wergera Soranî / Weşana Sîtav 2018 / Wan

Asya Xerzan ligel helbest û nivîsîna çîrokan, wergera ji almanî ji bo kurdî jî dike.

Dengê dayîka min min -1

Hayrettîn Guven



Dayîka min, Moka Hecî Momî Çewuş ji gundê Omera, sêwî bû ji ber ku dayîka xwe Besa Nofel zû çûbû ser dîlovanîya xwe. Kalikê min Hecî dîsa zewucî û heft kurikên xwe yên din bûn. Her heftan jî ji dayîka min re digotin Ayê (Dayê). Ne wek xûng lê wek dayîk didîtin. Min tu caran hîs nekir ku dayîka min xwe xerîb dît li mala bavê xwe. Xûng û birayên xwe ji yên bi rastî rasttir bûn bo wê.

Lê pişkoja îşlîgê qederê carekê şaş hatibû vexistin di destpêkê de. Keça apê xwe Hesên biçûkî çû rehetî û ji ber wê jî nasnameya wê danîbûn dayîka min û fermî dayîka min ne keça bavê xwe bû û heft sal pîrtir bû li ser xetê.

Xwendin!

Salên min belkî 13 belkî 14 bûn. Dayîka min xwendin û nivisandin nedizani lê ji bo xwendina kurikên xwe ji ti fedakarîyan berî nebû. Wexta ku min ders dikir, xwarin û vexwarin dida ber min û qet dengê xwe jî nedikir.

Dîsa ji dilê dayîkê bû. Wexta ku min pir ders dikir, digot.

”Bese lokî min tu çavan li xwe derxî?”

Dê li ser pişta bavê û bav li ser pişta lawê!

Salên min belkî 41 belkî 42 bûn. Dîya min di 16 salî wê de dabûn bavê min. Xenzûrê wê li ser zevîyê mêr pê girtibû û miribû. Anika min, xûsîya dayîka min, Zewa Horro (Alê Usivî Maçê)

zû ji dest û pîyan ket. Bavê min dîya xwe li pişta xwe dixist dibir doxtoran.

Rojekê bavê min ji ketibû destan û birayê min Serkan ew li pişta xwe xist dibir mala xûnga min Latîfeyê.

Dayîka min got:

”Xoyratîno, îşta weng bavkê we jî daka xwe li pişta xwe bar dikir tewir doxtor bi doxtor digrand. Niha jî kurikên xwe wî li pişti xwe digerinê. Xûdê emagan li boşê nexê!”

Kilamên li ber makîneya şîr!

Salên min belkî 11 belkî 12 bûn. Dayîka min car caran bi makîneya şîr, şîr lê dikir. Wexta

ku ez biçûk bûm jî tê bîra min ku we kilam digotin. Rojek ji rojên Xwedê ez dîsa bi lez ketim hundirê aşxaneyê. Dayîka min dîsa kilam digot, bi dengê giran lê bi meqamekî wek dengbêjan distira. Kengî ez ketim hundir dengê xwe birîya wek kêrê. Xemxeyal tê bîra min ku bi kitana xwe ya sipî çavên xwe paş kirin.

Bo çi digirî? Bo dayîka xwe?

Salên min niha 48 in û her cara ku tê bîra min, ez bi daka xwe re li aşxaneyê li ser dîya dîya min ez digrîm.

Digot:

“Onê, Onê ew çi bû hat serê me, ez qurbanê...”



Begê Rewandûzê

(navê vî begê nayê nasîn)

Chris Kutschera, di gotareke xwe de qala çend fransîzan dike ên ku di dema xwe de rêwîti li Împeratorîya Osmanî kirine, û wan wek pêşengên kurdolojîya fransî dibîne.

Yekî ji wan jî Baptîsîn Pujula ye. Pujula di sala 1837an de diçe Împeratorîya Osmanîyê. Di dema ku li ser navê nîzam-î cedît û merkezîkirina desthilata împeratorîyê, ordîya Osmanî li Kurdistanê li hember mîrektîyên kurd şerekî dijar û seferberîyeke mezin daye destpêkirin de, şahidê

bûyerên ecêb dibe. Di encama van êrişan de, mîrektîyên kurdan yek bi yek ji holê tên rakirin. Em şewat û wêrankarîyên wan salan, trajedîyên nedîtî û zilmên dirindeyî, bi taybetî, ji nameyên Moltke dizanin. Lê çavênîyên Pujula jî bi yên Moltkê teva di-kin. Pujula jî mîna Moltkeyî, “bi sempatî li kurdan nanêre”, lê herduyan jî rastî, ango çi dîtine, ew nivîsîne.

Baptîsîn, çawa ku Chris Kutschera dibêje, van çavênîyên xwe, bi navê “Rêwîti”, di sala



1840an de çap dike. Û ji destê yekem, qala ordîya osmanî ya ku bi serkêşîya Hafîz Paşa êrîş bîriye ser Begê Rewandûzê, dike.

“Piştê ku Begê Rewandûzê teslîm dibe, şer ji her demê zêdetir gur û diwartir dibe”, dibêje, Baptîsîn Pujula. “Kurd, ji xiyane-ta hin serokên xwe qehirîn, şerekî bêmefer, lê bêhempa didin. Li herderê şervanên kurd derdikevin, ji mêrxasî û nebezîya berxwedana wan, Ordîya Osmanî şaş û metel maye. Tu heyf û mehrîbanîya kurdan ji dîlên eskerên tirkên re nemaye. Mix li wan dikutin, çavên wan derdixin, wan bi zindî dişewitînin. Paşê bersivê wan bi qazox û singxistinê yên li girtîyên kurdan dide. Tolhildanên wer

hovane sê meh in berdewam in. Ordîya Osmanî 4000 eskerên xwe wenda kirine. Gundên kurdan bêhesab hatine şewitandin...

“Ez çawa dikarim, niha nêzikî gundê Ergaxê, sehneya ku temaşa dikim, vebêjim? Di quntarên Alaca– Daxê, di dereke tozîn de, li yê ku ti sîber têde tune, 4000 girtîyên kurd, ji her temen û zayendê wek dîl hatine girtin. Wan tu caw an paç nîne ku pê ji xwe re kon çêkin û ew di bin şewata tavê de mane. Ew nikarin di vê germahîya han de xwe ragrin, rûyên xwe dixin nava tozê. Piranîya wan zîlam, jin, keçên ciwan û zaro seranser tazî ne. Li hinekan tenê parçeyeke caw heye ku pê dorûberên xwe pêçane.



Rûyên wan êş, keser û bêmeferîyê nîşan didin... Hawar û qirîn, hêstir û girîyên wan 4000 kurdan, ezaba hovnak a mehkûmên dojhê tîne ber çavê mirov.”

„Ev mirovên bextreş, ev bûn şeş roj ku li vir in; ji bo xwarinê piçek nanê reş, piçek jî ji çemê vir avê didin wan. Di nav sê rojan de 20 zarokên berşîr, ji ber ziwabûna şîrên dayikan, di destên dayikên xwe de mirin...”

Piştî ku wêrankirina gundên kurdan 10 teswîr dike, Baptîsîn Pujula, behsa serpêhatîyeke bêhempa dike ku di dema seredana wî ya pêşîn a ku di qerergeha Xafîz Paşayî de diqewime. Li wir, ev sehneya şikencê û berxwedanê wek derbirîna mêranîya kurdan vedibêje.

Pujula dinivîse ku “Zilamên kurd henin ku bi qerektêre-

ke derhişî ne. Yek ji serokên kurdan ê herî nebez —ê ku hê neketîbû 30 salîya xwe— ji alîyê tirkên ve hatibû girtin. Ew yekî dirêj û pir bedew bû, kesî hê bi qasî wî kurdekî çeleng nedîtiye. Ew birin ba Hafîz Paşa. Heger wî pêşwazîya wezîrekî bikra, jê zêdetir bal û giringî jê re nedihata dayîn. Hafîz Paşa û Qadî, bi dût û dirêjî digel rêberê kurd ê ciwan re peyîvîn, wan ceribandîn da ku ew bidin qenehkirin ku di derheqa mewzî û sengerên kurdan de agahdarî bide wan. Generalê Osmanî heta soz da wî ku wî bike Mîralay di ordîya xwe de, heger wî bi dilxwazî bersivên pirsên wan bidaya.

„Xêvik û bêhiş nebin, gotiye kurd, ez nabim Rewandûz Begê (yê ku teslîm bûye) duyem. Piştî ku ez bûme rêberê kurd, wê tucarî

ez nema bibim rêberê mirovên din. Heger di yekîneyeke ordîya we de serleşkerek bama, min ê ew bizîviranda li hember we, Xwedê jî dizane ku ez ne xayînek im. Ji bo azlûyên ku hûn li bendê wê ne ku ez ji we re eşkere bikim, hûn wextê xwe wenda dikan. Carekê bextreşîyê ez xistim nava destên we, hûn çî dikarîbin bikin, fermo, bikin.”

Hafiz Paşa yê ku hêvîya xwe ya wazdina wî yê bi gotinan wenda dike, dizîvire ser şikenceyan. Generalî emir dide ji bo ku panîyên wî bi 500 caran li feleqeyê xin. Ser zikê xwe dirêjikirî, gava li kurd dixistin, wî “çibûkek” xwest û dest bi kişanê kir, weka ku tu êşê nedihesiya.

„Ev sezaya hovane bi dirêjahîya du rojan dom kir, di ya roja sêyem da jî kurdê camêr hatibû tazîkirin û ew xistin nava teştê ku bi ava germ hatibû tijekirin. Di derbarê berxwedan û tevgera kurdan de heman pirs cardin jê pirsîn, lê ti gotin ji devê wî derneket.

“Tu bersiv nadî, digot Hafiz Paşa, ma dengê min nayê te?”

“Şûkir ji Xwedê re, guhên min baş dibihîsin, lê zimanê min ê ji we re her lal bimîne”, bersiv dida rêber.

„Bi kîjan şikenceya ji wê girantir em dikarin wî bînin ser rê da ku biaxife” –dipirsiya Qadî.

Rêberê kurd ê ezabkêş zilamê li pêş xwe nîşan da wan û got:

“Ji dîtina kurdekî tirsonek î ku ji hevalên xwe re bêbextî kiriyê û xwe teslîmê dijmin kiriyê mezintir şikence tune.”

Gava ku kurdê xwe radestkirî, van gotinan dibihîse, destê xwe davêje sîlehê, wê dixê nava devê xwe û xwe pê dike.

Çend deqan şûnde jî kurdê rêber di ava kelîyayî de dimire.

Kuçerayê ku mîna her fransîyekî gelek çîrok û serpêhatîyên leheng û qehremanên dinyayê guhdar kiriyê, ji wê vebêj û çîroka Pujulayî, ya li ser rêberê kurd yê herî çeleng, lê nenas û bînav digihe vê bawerîyê:

“Dîroka kewnar ji wê bîşereftir mîna keke din a welathezîyê ji me re diyar nekiriyê. Ti leşker an rêberekî yunanî yan romayî ji wî “hovê” ciwan qehremantir nebezî û dilsozî nîşan nedaye, ew ê ku دنیا ê navê wî tucar nema bizane.”

Jordan

14 avrîl 2022 (2634)

TALDE

Bêrîvan Xizênzêr

Eyy cimattt! Eyy şênîyên axa sar! Xweda îro li me hat xêrê, bilîlîn û bireqisin. Îroj roja xweşûştina me ya ji gunehên me ye. Eyê, serê xwe hilde! Îro enîya te heta hetayê hat hilmaştin. Ji niha bi şûn de dê ti evdên Xweda yê bi ferxêsbûna min, bi ferxêsbûna lawê te nizanibin.

Eyy cimat! Xecêêê, xezala berrîyê! Bila dengê min bigihe te jî. Mêranîya ku min kezîyên te yên reş jê re kirî qurban, ew mêranîya ku piştî 60 salî bûyî sedema vegera te ya malbirayan û bûyî sedema mirina te ya li berlingên jinbirayan, ez ê îro li vir bikujim.

Şeş sal di ser zewaca me re derbas bûbûn lê hîn jî zaroyek ji me re çênebûbû. Her roj di nava malê de himehim û pitepita eya min ya bi ser Xecê de bû. Her carê mane bi tiştinan digirt û mîna ku ferxêsbûna min li wê eyan bibe zikdirî didan Xecê, ji nan û ava destên wê pê bûyî nedixwar û venedixwar. Carek be jî nehişt ku Xec jî mîna keç û bûkên malbatê kincekî rind li wê bêjna xwe ya tenik û kûbar bike û biçe nav keç û bûkên cîranan.

Ji alîyekî ve jî di ber min re diçû û ez li Xecê sor dikirim, digot “ Ev bû şeş sal vê bûkê ji te re zarokek nêanî, zarok ji vê bûkê

çênabin lawê min, were bi ya min bike, yan em vê bûkê bibin ba Ema Elî bila dermanekî li vê bûkê bike an jî divê tu li ser vê bûkê bizewicî.” Ez bi dilê xwe bi Xecê re zewicî bûm û me ji hevdu hez dikir û loma jî her ku wê ji min re behsa zewacê dikir, min digot “Eyê, dev ji van tiştên beredayî berde, ez ne wê dişînim mala wê falbazê ne jî li ser wê dizewicim.”

Min kir û nekir min bi eya xwe nikarî û danê ez ne li malê bûm, ji xwe re kiribû fersend û Xec biribû mala Ema Elî jina falbaz. Ew jî ji xwe ve gihaştibû wê encamê ku zaro ji Xecê çênabin û çend dermanên kurmancî li wê kirîbûn. Wê êvarê Xec ji ber êş û jana laşê xwe heya sibe nehewîyabû. Destê Xecê di kefa destê min de, çavên min jî di pencere re kêlî bi kêlî li hêviya berbanga ku vê bêçaretîya min ronî bike, wisa bi ax û nalîn me sibe li xwe ronî kir.

Ji bo ku siwareyekê peyda bikim ez bi berbangê re ji malê derketim. Min xwe bilez û bez gihand nava gund û min siwa-

reyeke di wir re derbas dibû rawestand. Piştî du seetan jî em gîhan nexweşxaneyê bajêr. Du hemşîre pekîyan hawara min û Xec ji hembêza min girtin dan ser darbestekî û birin. Biqesî du hefteyan jî nehiştin ku çavên min bi bejna Xecê kevin.

Ew herdu hefteyên ku Xec bêxût raza bû, ji min re bûbûn du hefteyên azarî ta ku dengê axaftina di navbera du hemşîreyên ku dema li hola nexweşxaneyê rastî min dihatin û bi awirên xwe nifir li min dibarandin gihaştibû min. Hemşîreyan digot: ”Xweda hevza me ji jinên mêtûmêr bike, ji bo ku xelk nebêje kurê wan ferxês(sewr) e, ew ê qestî canê bûkên xwe bikin. Qey tu dibêje ya ku ji lawên wan nayê, ê ji gil û gîyayên ji doralî berhevkirî were, hahaaa haa. ”Ev gotina hemşîreyan ku mîna bizmarekî di mêtûyê min re çûbû xwarê, wê şevê û gelek şevên din jî xew nekiribû çavên min. Di xewnerêşkên min de pistepista hemşîreyan berê di nav nexweşxaneyê de olan dida, pişt-

re li nav kolanên bajêr piştî jî li nava gund bilind dibû: "ferxês... ferxês... ferxês..."

Êdî nema min dikarî rûyê xwe bi rûyê wan hemşîreyan bixim û rewşa Xecê bipirsim. Bi êvaran diçûm otelê radizam û bi roj jî li ber çayxaneyê ku li hember nexweşxaneyê bû, rûdinîştim.

Piştî çend rojan bijîjkek hat li hewşa nexweşxaneyê li hemberî min sekinî û bi hêrs got: "Ma ne bes e! Ti nema bû ku hûn jinikê bikujin, îcar bi ser de jî tu wê rebenê wisa ceza dikî? Tu çima naçî ba xanima xwe û bi wê re deng nakî berdilê wê de naçî?" Ez ji cihê xwe rabûm û serê min di ber min de, bêtî ku gotinekê bikim min piştî xwe da bijîjk û ez çûm otelê. Lê dengê hemşîreyên ku di guhên min de diçingîn, heya sibe ez di nav nivînan de gevizandim: "ferxês... ferxês... ferxês..."

Dotira rojê ez çûm odeya bijîjk û min jê re behsa hal û meselê kir û piştî çend gotinên dilmînî bijîjk dest bi tehlîlên min kir, yê ku encamên wan piştî hefteyekî dîyar bibin û ji wê rojê bi şûnde jî bibin xewnerêşka Xecê.

Ji wî derîyê hewşê yê ku berî mehekê ez bi sîvikîya xortekî bi bazdan jê derketîbûm mîna termekî xwîn ji laş kişîyayî ketîbûm hindur û bi rojan ji malê derneketim.

Bextreşa eya min zû bi rewşa min hesîya lê dîyar bû ku ew ji min jî bêhtir ji rastîyê ditirsîya. Lê ji alîyekî ve jî ew tundîyên xwe yê berê dîsa li Xecê diki-rin. Rojekê min gazî eya xwe kir, destê wê xist kefa destê xwe û min ji wê re rastîya meseleyê vegot. Da ku êdî tundîyan li Xecê neke lê wê rastîya min heya îro ji Xecê veşart û ji ya berê jî bêhtir tundî li wê kirin.

Evînek li min peyda bû

Evînek li min peyda bû
Mîna esman bêdawî ye
Lê firiyam, lê firiyam
Li bêdengiyê wenda bûm

Evînek li min peyda bû
Wek derya kûr û fireh e
Pêl bi pêl tim diçeliqe
Li şînariyê wenda bûm

Evînek li min peyda bû
Wek şewq û tîna rojê ye
Qemişand her du çavên min
Li ronahiyê wenda bûm

Evînek li min peyda bû
Wek hîva şeva tarî ye
Ketim pê ez der bi der çûm
Li tarîtiyê wenda bûm

Mûlla Evîndar



LUDÎNGÎRR

“Ez mamoste, helbestvan û nivîskarekî sumerî me!

Ludîngîrr nivîsên xwe li ser 23 tabletên ji axê bi nivîsênmixî nivîsandîyê. Ew nivîsê li jêr tableta yêkemîn e.

Min nexast ku nivîsê şîrova bikim. Nivîs gelek vekirî yê. Ludîngîrra ew nivîsa nêzîka 5000 salî berê nivîsandîyê.

Ludîngîrra ji bajarê Nippurê bû.

Ev Ludîngîrra ye, yek ji sê helbestvanên sumerî ku navê wî hatê roja îro maye.

Gotinên ku me li jêr anîne ziman, agahiyên di lewheyên bi tîpên mix de ne ku sumerolog Muazzez İlmiye Çığ ji devê helbestvanê sumerî Ludîngîrra li ser çanda sumeran vedibêje. Xebat ne fîksîyon e. Em helbestvanên sumerî, Ludîngîrra, Enheduanna û Dingiraddamu dizanin. Tenê sisîyan ji wan înzeyên xwe bikaranîne. Li vir Ludîngîrra yek ji sê helbestvanên sumerî ye ku navê wî maye.

“Ez mamoste, helbestvan û nivîskarekî sumerî me. Ji ber ku ez heftêûpênc salî bûm, min dev ji mamostetîyê berda. Lê, helbest û nivîsandina min belkî heta mirinê yê berdewam bikin. Min dest bi nivîsandina vê çîroka jîyanê bi piranî ji bo nîfşên pêşerojê re kir. Nasname, ziman, kevneşopî, jîyana civakî û hunera me tê jîbîrkin. Ji her alî ve çavê xwe didin vî welatê xweş û şaristanî.”

Ew bi awayekî prîmîtîf hatin ser axa me û bi saya me dest bi şaristanîyê kirin. Zanîna wanan, ji nivîs, çandinî, huner, ol, dibistan, hesp, erebe, hîv û stêrkan tune bû. Ew hemû ji me fêr bûn. Paşê dest bi pesnê xwe kirin ku “me kir, me dît”. Ez herdem ditirsim ku rojekê navê me û şaristanîya me were jîbîrkin. Me çi xûliqandîyê, em bi çi serketinîne yê bibêjin hemû me çêkirîye.

Vê endîşê, ez bi salan xemgîn û aciz kirim. Ez merivekî piçûk im, min gilî dikir ku ez nikarim pêşî li wan bigirim. Rojekê, ji nişka ve hat bîra min. Ji ber ku ez nivîskar im, min bîryar da ku çîroka jîyana xwe binivîsînim. Ez ê ji xelkê xwe

re destkeftî û destkeftiyên milletê xwe, rabirdûya me, kevneşopîyên me, em çiqas şaristanî bûn, hem ji bo ciwanên me yên ku sûmerîtiya xwe ji bîr kirin, hem jî ji bo nîfşên pêşerojê bihêlînim. Bi vî awayî, ez hêvî dikim ku bigihîjim her alî, her kesî, her temenî...” (Tablet 1)

“Li mala me çeşît û çeşît malzeme hene. Maseya xwarina me ya li ser eywanê û kursiyên bi piştta bilind û bi lingên xaçê eşyayên yêkemîn balkêş in. Li odêyên ji bo rûniştinê li dora dîwaran mînder têne danîn. Em li ser erdê di nivînên ji hirî ji ka û gîya, an jî li ser doşekê darîn radizin. Cîyê xwe yên ku ez pir jê hezdikim sala berê dema ku ez zewicîm ji hêla xeratak ve heta çêkirin. Di çar lingan de çarçoveyeke darîn a bi têlan hatîye danîn û li ser wê nivîna min heye. Her wiha serê darê ku bi wêneyên kulîlk û çûkan hatîyê xemilandin jî heye.

Çiqas zor e ku ez di vî nivînê de razê!

Bîranîna wan şevên evîndar û xweşewîst ku min bi jîna xwe ya delal re derbas kiribûn, hembêz bikim!” (Tablet 15)

Werger ji tirkî: Seyfi Doğan



Oscar Wilde, 1854an li Dublinê hatiye dinê, 1900î li Hôtêl d'Alsace li Parîsê mir. Nivîskar, şanonivîs û satirîstê civakî yê îrlandî bû.

Em gîşt qiral in

Oscar Wilde

Wergera ji almanî: **Nuh Ateş**

Li ser makderîyên dinyaya entîk wer nivîsandibûn: “Xwe bixwe nas bike!” Li ser derîyên دنیا me ya nû gerek e wer bihê nivîsîn: “Tu wekî xwe be!” Ferdiyatî ya di sayê şabûnê da geş bibe. Meriv bi hesretê wê ye ku têrûtijî û hîskirî bijî. Şayed wî ev bi cih anî, beî ku zor lê bihê kirin yan bihê tehemûlkin, şayed her çêşîd

mijûlî wî şabike û şabûn be, ew ê bi hêz bibe, sihetxweş bibe û kulturê qezenc bike: Ew ê bibe ew bixwe.

Bi dîtina min meriv mikemel e gava ku ew di bin şerdên mikemel da geşbibe, merivekî ku neêşîne, nexerabkar, nerevok an her dem ne di bin tehlukê da be. Fikirîna li gor qerektera xwe ne ji xwe hezkirin e. Kî li gor qerektera xwe nefikire, qet

nafikire. Karkirin meydana dîtîne sînor dike, sêyrkirin berfireh dike. Tenê şehsiyet dinyayê diguherin, prensip hîç nikanin! Guhêrtina baweriya kesên din hêsan e lê ya xwe bi zehmet e. Bînin bîrîya xwe ku hemû şabûnên me jêhatîya şabûnîyê li hemû cîhanê zêde dike û li hemberî vê pêêşîna me derdûkulên dinyayê qet kêr nake.

Pêêşîna tijî egoizm e û hendik wekî nexwaşîyê ye. Di pêêşînê da tozîkek tîrsa xweparêzîyê heye. Ew tîr sinorkirî ye. Bi tevahîya jîyanê gerek e ku meriv wê hîs bike, ne tenê bi derd û kulên wê, bi şabûnî, xweşikî, bedewî, hêz û sihetxwaşîya wê va gerek e ku xwe hemaheng bike... Her ku pêêşîna zêde dibe ew her çû rastîtiya xwe wenda dike. Her kesek dikane derdê hevalekî parve bike, lê tenê şexsiyetekî rind têgihêştî dikane di pêşketina hevalê xwe da xwedî par be.

Xwepêşvabirin meneya hebûnê ye. Her yek ji me tenê wezîfeye çareser bike: Xwebixwe tîrûtijî ifadekirin. Lê belê îro her kes ji xwe ditirse. Û derheqê vayê da merivan wezîfeya xwe ya herî bilind jibîrkirin, wezîfeya li hemberî xwe. Ewê

xêrxwaz in, ewê segan, parseg û birçîyan tîr dikine û kincan li wan dikine. Lêbîlem ruhên wan bixwe tazî ne û di tengayîyê da ne. Cesaretê em terkkirine (terkkirîye – cesaretê yekhejmar) belkî ji ew qet bi me ra tunebû. Tîrsa ji civatê – bingeha ehleqê – û tîrsa ji Xwedê – Sirra her olekî – ew in hêzên ku li ser me hukimdar in...

Û dîsa jî, şayêd meriv xasjîyana xwe hetanî dawîyê bijî û eger ew her hîsekê şemayekê, her fikirînekê meneyekê, her xewnekê rastîyekê lê mehr bike – ez emînim ku hingê şadimendiyeke wekîna were dinyayê, di saya wê da emê ji hemû nexwaşîyên serdema navîn xelas bibin û şûnda vegehin ser idealên helenîzmê.

Erê, belku emê wan hîn zarîftir û dewlemendtir bikin ya ku li Yunanistanê nedihate zanîn. Lêbelem yê ji nav me wêrektir ditirse, ji xwe ditirse. Xweînkarkirina me reha xwe ya trajîk ji xwebirîndarkirina bejîyan da tê. Û em cirma feregeta xwe didin. Her kûtaneke ku em berî lê digrin, di hundirê me da dijî û jehrek e. Beden gunehkar dibe û di saya gunehkarîyê da

pak dibe. Ji ber ku kiryar her dem pakî ye. Ji bîranîya dilxwazîyê û têt dilxwazîya poşmanîyê bêtir qet tişteke paşva namine.

Îmkana ku meriv pêşîyê li jirêvîderxistinê bigre tenê ew e ku meriv li ber wê vekirîbe. Hûn li dijderbîkevin rûh nexwaş dibe ji ber hesreta biserketina arzûyê ya ku xwebixwe red dike, ji ber arzûya wehş ya ku wekî qanunên rezîl û dijî qanunan hatiye binavkirin. Meriv difikire ku pêkhatiyên dinyayê yên pêşker di mêjî da bi cihûwar in. Di mêjî û tenê di mêjî da mezintirin gunehkarîyên ku li dinyayê diqewimin dihên kirin. Zewq tehmkirina tebîatê ye, nîşana erêkirinê wê ye. Şayed em dilşah dibin em her dem baş in, lêbelê şayed em baş dibin her dem em ne bextîyar in.

Xwedîvîjdan bûyîn bi serî xwe tenê nîşana bikêmanîbûna pêşvaçûyîna me ye. Ji bo ku em hasas bibin, divê ev bitûn bi dozinî va bibe yek. Xwe inkarkirin ne tenê tevgerîneke ku meriv pê pêşvaçûyîna xwe bide sekinandin. Helecan

bo daxwazîya xwe bixwe armanca hunerê, armanca jîyanê ye û ne kêmtir ya civakê ye jî. Ji xwe, hez-kirin îhtiraseke bo bitûnî jîyanê ye. Ji min va wer xwîya dike ku mîna ku bibêjî em gîşt heyranê tebîatê ne, lêbelê kêmbi wê ra dijîn. Huner ferdîyatîti ye û ferdîyatîzm xwedîyê hêza xerabkirinê ye. Ji ber ku tiştê ferdîyatîti êriş dibe ser monotonîya tîpîk, koledarîya bi destî edetê, hepîsxaneya erfûedetan, bêqimetkirina însanan mîna ku ew makîne bin.

Her ku meriv zêdetir bi edebîyatê ra û bi jîyanê ra mijûl dibe, her dihere meriv aşîkar têdigihê ku tiştê herî şahane şehsîyatî ye.

Her kesek wekî qîral dihê dinyayê. Û piranîya wan li surgunê emrê xwe ji dest didin wekî pir qîralan.

Di derbarê şehsîyetê da her dem sirperdeyek heye. Meriv ne li pey çîle, ne li pey zewq û sefayê ye. Ji-yîn e – ew e xwazteke wî.

Jêhatîbûna bo hîskirineke bî-tîn û berfireh di hundirê xwe da

bêyî ku wê birastî bijîyî, xwebixwe sinorkirin e, yanê ji têrheyîye feregetkirin e.

Meriv dikane bimêrîne ku rene-sans çava ji ber vê berbi girseyîye helkişîya bûye, çima ku wê xwe bi pirsên sosyâlî va sînor nekirîye û lêbelê ji keseyatîyê ra serbestî cihîstîye ku ew vekirî geşbibe û di saya wê da xwe mîna merivên manîdar pêşva bibin. Pêşvaçûyîna civaka merivan girêdayî pêşvaçûyîna şehsa ye. Cihê ku lê dest ji pêşvaçûyîna şehsa hatiye berdan, sevîyaya fikrî ya civakê hema dadikeve.

Ez dikanim rind tesewir bikim, çava sifikkeneke îronîk li rûyê xwîşonek yê her mamosteyekî belav dibe, gava ku meriv bixwastiya ji wî ra bigotiya raste-armanca her cure perwerdekirinê tehma geşkirina hestên rexnedariyê ye. Geşbûnî qanuna jîyanê ye û tu geşbûnî tune ye ya ku berbi îndîvîdualîzmê dikişîne. Kîngê nîşanên ji bo vê tune bin, pêşvaçûn sunî dihê rawestandin an jî nexwaşî û mirinî li ser kar in.

Îndîvîdualîzm zordariyê nake, tersine ew merivan şîyar dike ku zorê qebûl nekin. Ew qebûl nake ku ji bo başîyê zor bihê bikaranîn. Însan baş in ger meriv wan serbest cihbihîle. Ferdiyatî kamilbûn e ya ku biveşartî di her cûrê formata jîyanê da heye û pê her cûre jîyan geş dibe. Huner îndîvîdualîzma dijwar e.

Însan, ger ew hukumdarê xwe be, dikane li hember derdûkederan serkeftî bibe, wer hêsan, wekî ku ew bikane dilxwazîyeke nû îcad bike. Teqlîd kirin li her derê neçê ye. Her kiryareke piçûk ya rojane şopa xwe li ser qarekter cih dihêle an wî xerab dike.

Her tiştê ku meriv li paş derîyên kilîdkirî rojekê meriv dê wan bi dengekî bilind ji bilindîya serxanî da ji dinyayê ra êşkere bike. Tiştê ku meriv derheqa merivekî da dibêjin, wî naguhêre. Ew çi ye, ew e. Dîtina alemê çi ye tu qîymeta xwe tune.



Darkêşê taxa Tokiyê

Ev çend sal in ku dema em li şaneşîna xwe rûdinin û li taxa Toplu Konuta Seyrantepe ya Amedê mêze dikin, dibînin ku kalekî destên wî li piştê wî û di nav xanîyan de li tişt miştan digere, lê bi tenê dar, êzing û textikan berhev dike, bi kindir û têlan girê dide û li dûv xwe dikişîne û dibê. Çend roj berî niha bi tesedufî em di nav Toplu Konutê de rastî kalê darvan û êzingvan hatin. Wî dîsa çend gulîyên daran bi kablo girêdabû û kindirê ku tim weke qayîş û kembere li piştê bû jî avêtibû serê loda daran û li dûv xwe dikişand. Bi piranî kurd dar û êzingan yan didin ser milê xwe, yan jî dikin piştî û li piştê xwe dikin. Lê ev kal dar û êzingan girê dide û li peyî xwe bi erdê

re dikişîne. Dema me bi paş ve nêzîkî lê kir, min ji Rojînê re got, “ez ê ligel wî sohbet bikim û tu jî wêneyên me bigire. Darên wî yên ku li nava cadeya mezin ji girêya kabloyê ve bûbûn û belawela bûbûn ew jî wxarê erdê bûbû û şaxên darên xwe didan serhevdu bi cî dikirin û heta hêza wî hebû serê kabloyê dijdand, girê didan. Em ber pê çûn bi dengêkî bilind min silav da:

“Merhaba pismam!”

Dest ji girêdana darên xwe ber da, serê xwe rakir û bi awirekî meraqdar li min nêrî. Dema em rû bi rû man, min dît ku xizanî, belengazî û xemgîniya salan li ser rûyê wî xwe nîşan dida. Bi awayekî westî bersiva silava min da.

“Merhaba û ser çavan!”



“Te îro êzingên xwe baş girê nedaye, înat dikin li pey te nayên?”

“Rast e, îro kindirê min ê dirêj ne bi min re bû, loma dikim nakim ji ser hevdu dikevin û ez nikarim li dûv xwe bikişînim.”

“Ev demeke dûr û dirêj e ku em te dibînin tu her roj derdikevî nav taxa *Toplû Konutê* û tim dar û êzingan ji bona şewatê ji xwe ra dibî.

“Rast e.”

“Tu van daran ji xwe ra ji bona şewata sobê dibî? Yan jî difiroşî?”

“Ev êzing têra germbûna mala me nake. Firostina çî.”

“Em dibînin hinek kes jî

kartonan berhev dikin û dibin difroşin. Tu çima kartonan berhev nakî?”

“Ma bira karton li ku hene. Yên ku erebokên wan hene kartonan kom dikin û dibin difiroşin. Ereboka min tune.”

“Erebokek bikire?”

“Ma ka pere? Pere tune, tu dibêjê erebok bikire.”

“Tu ji ku yî?”

“Ez ji gundeki Hezroyê me.”

“Kîjan gund?”

“Ez ji Hondofê me. Ma te navê Hondofê bihîstîye?”

“Belê min bihîstîye û dizanim li ku ye.”

“Tu ji ku yî?”

Ez ji Licê me.”

“Ji kîjan gundê Licê?”

“Ji navenda Licê me, pismam. Te çima û kengê ji Hondofê bar kir û hatî navenda Amedê, taxa Azîziyê?”

“Ew sala ku dewletê û korîciyan gundan şewitandin, me malê bar kir û em hatin vir.” “Sala 1993an na?”

“Sal tam nayê bîra min, lê di wan salan de bû.”

“Ma gundê we jî şewitandin?”

“Lê çawa! Gundê me du tax bû. Hema berêvarek esker û korîciyên gundê *Sinê yê ku li ser Licê ye* û çend gundên din derûdorê li gundê me girtin. Me ji malan kirin der. Agir berdan xaniyan û şewitandin. Em neçar man û me bar kir navenda Dîyarbekirê. Wele îmkânên me tune bû ku em bi dereke din ve herin. Em hatin li vir bi cî bûn.”

“Niha li vir xaniyê te heye?”

Destê xwe ber bi berbajarên (gecekonduyên) Azîziyê ve kir û axavtina xwe domand.

“Ha li wir qulikekê xaniyê min heye, em di bin de star dibin.”

“Çend zarokên te hene?”

“Çar. Du zewicî ne û du jî li mal, li cem min in.”

“Tu debara xwe çawa dikî? Maeşê te heye?”

“Na, maeşê çî, halê çî! Ma tu halê min nabînî.”

“Tu dixwazî vegeerî gundê xwe?”

“Ez ê çawa vegeirim gundê xwe. Ma gund maye ku ez vegeirim gund. Dihêlin ez wekî berê li gund bijîm?”

**Amed Tîgrîs &
Rojîn Zarg Tîgrîs**

Malê dizan nabe

Mem Xelîkan

Silo di nav nivînan de çend ro raneketibû. Nav alavê de dişewitî. Heftêkî berê li dibistanê bi hevalan ve bi goga lingan dilîstin. Hevalekî wî, ji bo ku gogê bi dest xwe xe, dest pêranaye û ew gêrkiribû. Silo ji junî de birîndar bûbû. Mamosteyan birîna wî şuştin, pak kirin û dûwa kewandin. Ew birîna li ser bû kuleke mezin. Junî her çû werimî, sor bû, halê wî jî her çû xirabtir bû. Dayîka wî û jinên cîran, çend dermanên wê demê ku pê dizanîn lê kiribûn, lê ti fêde nekiribû.

Dayîka Silo Nûr, bêçare nedizanî çî bike. Silo di nav ar û alavê de dişewitî. Ji mêrê xwe Hemo re: Tu li çî rûniştî yî, va lawika î di dest me de bimire. Rabe here, cîranekî hevalekî ma di hewara me werin. Silo bibin bajarekî, bibin toxtor.

Silo: Bavê min, şivan bû. Pezê çend cîran û gundîyan diçêrand. Tineyî bû. Em di maleke ji du gozên biçûk û mawênîyekê de

dijîyan. Xanîyekî ji xwelîyê bû. Her berf û baran dibarî, dilop dikir û herder şil dibû. Ez di nav nivînan de dicirifim, diqefilîm, dayîka min jî paç şil dikirin di da ser enîya min û canê min ku wê ar û alava min vemirîne. Ez di wî halî de bûm ku bavê min bi cîranekî ve ereba hespa koş kirine ereba cîranê me, hatin ber malê.

Zivistana Romê berfê li erdê, eyam jî sar bû. Dayîka Silo, ew bi nivîna ve di erebê de bi cî kir. Cil û corin jî avitin ser ku bi rê de neqefile. Hemo û cîranê wî jî xwe qêm şidandin û bi rê ketin. Li bajerokê gund tê girêdayî toxtor tunebû. Dixwaze ew herin bajerokê cîran. Navbera wî û gund, 25–30 km bû. Di rê de, berf hebû. Hesp bi qar diçûn. Mij jî hebû. Lê qasî rê şaş bikin ne î zêde tîr bû. Di ser çend gundan re derbas bûn. Bi nîvro re gêhêştin bajerokê cîran. Li nexwaşxanê, qelebelixî zêde bû. Kal pîr û jinên bi dergûş li wir civîne dora xwe ya mîeyenê dipan.

Silo: Dora me hat, em ketin cem toxtor birîna min ji hev kir hêrs bû. Ji bavê min re “We lawikî kuştî, ji min re anîye. Birîna wî yî pir xirab e” got. Bavê min tişteke fêhm kir, nizamim. Qe deng nekir. Tenê serê xwe berjêr dihêjand. Birîna min pak kir, kewand dûva derzîyek li min xist. Deh derzî jî nivîsandin, got: hûn ê li gund sibê êvarê du caran lêxin. Nav dermanan de çend melem û heb jî hebûn. Bavê min, em cem toxtor derketin şuva çû dermanxanê ew kirîn. Ji bo ku hesp vêsên û em xwarina xwe bixwin, qasî du saetan em li wir man. Dû nîvro em bi rê ketin. Bi eynê çile û belangazîyê dev deve êvarê em vegehrîn gund.

Silo ji toxtor vegehrîn şuva çend rojan li mal, dermanên wî cîranekî li eskerîyê sihihiye bû lêkirin. Birîna wî, bi ser derman û derzîyan ve hêdî hêdî berve rindîyê va diçû. Tenduristîya xwe ya berê bi dest xwe xist şuva, nûva dest bi dibistanê kir. Dibistana serete xilas kir şuva, wek bavê xwe dest bi şivanîyê kir. Kar û bexê cîranan çêrandin. Vaya qet nedîçû xoşa Silo. Malbatên rewşa wana î aborîyê baş, yê

dewlemend zarokên xwe dişandin bajarên mezin, didan xwendin. Mala tineyîyê bişewite, dê û bavê Silo ti derfeta wana î Silo bidin xwendin tunebû. Wek gotineke mezina “Kara li şûnê bizinê mexelê.” Wî jî, ji ber bêderfetî û tineyîyê dest bi karê bavê xwe kir. Li gund hetanî çû leşkerîyê şivanî kir. Lê ew bi wê rewşê qet neyî razî bû. Çavên wî tim li der bûn. Dixwast ji gund derkeve, here bajerekî mezin, nexwîne jî bişuxule jiyana xwe biguhêre. Bêcare bû. Çû eskerîyê.

Li eskerîyê pir hevalên wî çêbûn. Yek ji wanan Celal bû. Hevalekî cane can bû. Ji hevdu venediqetîn. Xwarin û vexwarina wanan cûde nedîçû. Celal ji Ankarayê bû. Li gor gotina wî, li Ankarayê karekî xwe yî baş hebû. Ji Silo re digot “Tu dixwazî, me eskerî xilas kir ez dikarim li Ankarayê alîkarîya te bikim. Ez ê te li wir bi cî bikim û ji te re karekî baş jî bibînim. Tu ê ji gund xilas bî.” Silo bi wan gotinan gelek şa û xenê dibû. Bi çar çavan, xilaskirina eskerîyê dipa. Ji şivanîyê xilas bibe. Li bajerekî mezin, jiyana xwe bidomîne. Perra qezenc bike û ji bo debara dinê

alîkarîya bavê xwe bike. Roj bi wan xem û xeyalan derbas dibûn.

Eskerîya xwe xilas kir şuva, Silo vegeerîya gund. Bavê wî yî di nav cîyan de bû. Dest ji kar berdaye, êdî ti halî wî yî şivanîyê an jî karekî din bike nemabû. Çoyê xwe avitibû. Di wan du goz hode û mavênîyeke ji xwelîyê de, tu yê bêjî ku mînak rojên emrê xwe yên dawîyê dijî. Di nameyên xwe de, dê û bavê wî ji bo ku ew pê neêşê qet qala wê rewşê nekiribûn. Wê yekê jî şewqa Silo şikandibû. Barê malê ketibû stuyê wî.

Silo: Xizantî bela serê me bû. Feleka me ya xaîn, qe destê xwe ji pîstê me nekişand. Bavê min î nexwaş di nav cîyan de ye. Barê debara malê di stuyê min de bû. Eskerîyê vegeerîm deh – panzdeh rojan şûva, min ji cîranan bêlek pez berhev kir û dest bi şivanîyê kir. Ya hûn bizanin, min çoyê bavê xwe li erdê nehişt. Zatî, ti çareyek min e din jî tunebûn. Şeş mehan şûva, bavê min rehmetî bû. Ez û daya min, em bi serê xwe manî. Di wê navberê de, ji hevalê min Celal çend name hatin. Min jî bersîva her nameke wî dayê. Ez dixwastim cem xwe. Min hêvîya wî nedibirî. Min jê

re tim digot, ez ê werime. Dema min va fikira xwe, ji dayîka xwe re kat kir, pir pê êşî. Got: Ji te bêtir, kî min heye? Tu yî min ji kê ra cih bihêlî herî? Eza bi serê xwe, bi tenê çi bikim?” Min jî dizanî, ew çi tiştêkî bi qar e. Lê min biryara xwe dabû, ti çarê min e din tunebû. Min jê re got, ezî herime pera qezenc bikime, malekê bigirime û te jî bibime bajêr. Bi wê yekê, tenakê fireh bû.

Çend mehan şuva Silo bi ya xwe kir. Biharê nû dest pê dikir. Xwelî yê hê şil bû. Her der kesk dikir, li neqew û serê çîyan berfa hê nehelî xuyadikir. Silo di otobosa Ankarayê de kûr kûr difikirî. Wî jî nedizanî pêşeroj ê çi bîne û çi bibe. Dayîka xwe li gund bi tenê hiştibû. Ji bo jîyanek nû ketibû rêya xerîbîyê. Dema otobos gihişte qeraja Ankarayê, dî Cemal li wir benda wî dipê. Peya bû, dest di stuyê hevdu re birin, hevdu maç kirin, ketin destê hev û berê xwe dane navenda bajêr. Xwarin xwarin, çay vexwarin şuva li qada Etfayê hatin hotelekê. Ew der, cihê Cemal bû. Cemal jê re got: “Huro şuva em herdu ê di vir de bimînin. Vira mala me ye.”

Cemal, çend rojan Silo li hotelê

ci dihîşt diçû kar. Digot: hetanî çend rojan tu jî dikarî dest bi kar bikî. Silo jî diçû nav bajêr digerrî û dihat hotelê. Cemal her ji kar vedigerî, bi perene pir vedigerî. Bêwext ji kar vedigerî. Bi nîvro, dû nîvro, ber êvarê kengê dixwast bi wê wextê dihat. Wê yekê, Silo dikire gumanan, şik dikete dilê Silo. Rojekê, Cemal ji kar vegeerî dît ku kincên wî dirî ne, dev serçav xwîne, berçavên vî mor bûne. Wek hatibe êngavtin. Cemal got: “Li rawestgahê otobosê min bi yekî ve ji bo dorê şer kir.” Silo ew gotina wî qet bawer nekir. Lê ti çareyên wî yên din tunebûn. Li wî bajarî, ji xeyrî Cemal ti nasên wî tunebûn.

Silo: Li hotela me, li hodeke hember me du xort diman. Şagirtên zanîngahê bûn. Abuzer, ji Adiyamanê/ Semsûrê bû, beşa tenduristî/Tibê dixwand. Heco, ji Rihayê bû, beşa mamostatîyê dixwand. Herdu xort jî pir baş bûn. Kurd bûn. Ji min hez dikirin. Çend caran ez birim hoda xwe li min şîret dikirin. Dizanîn ez û hevalê min çî karî dikine. Dixwastin, ez ji Cemal veqetim, vegerim gundê xwe.

Min fêhm dikir ew rindîya

min dixwazin. Lê bêçare bûm. Ketibûm dest nerindekî, dest dizekî. Ma xwedê kesî rastî nerinda nîne. Ji ber bêçarebûnê, ketibûm rêke nebaş.

Heftekî duduya, min dûre dûr Cemal dinêrî ka ew çing li berîya dixe an jî çing dizîyê dike. Sibê em radibûn, diçûn ber nexwaşxanan, diçûn qeraja otobosan derên qelebelix. Cemal karê xwe dikir, min jî ji bo wî karî bi dest xwe xim, ew çav dikir. Dûva em vedigerîn hotelê. Çend hefta şuva ez jî bûbûm dizekî hoste. Wê navberê de ez çend meha carekê diçûm gund dihatim. Min sere-dana dayîka xwe dikir, pere didan wê û vedigerim ser karê xwe. Min ji dayîka xwe re an jî ji cîran û hevalan re digot ez loqentekê de kar dikime.

Di wî karî de, Cemal û Silo carcaran ji alî polisan ve dihatin girtin û ew binçav dikirin. Lê çend rojan di qereqolê de dihatin girtin û berdidan. Rojekê Cemal xwast li çentê jinekê xe. Çente bi milê jinikê ve bû. Dema Cemal dest avite çente kişand, jinikê çente berneda û gêr bû. Cemal jî lingê wî terîşt û ew jî gêr bû. Merîyên li wir, dorpaş wanan

hewş kirin û Cemal girtin. Jinik ji serî de birîndar bû û rewşa wê nebaş bû. Polis hatin, Cemal birin. Wê carê, dozger/sawcî Cemal hepis kir. Silo bi serê xwe mabû.

Silo: Bi ser girtina Cemal ve, ez diltirsokî bûbûm. Dixwast, ez hepsê de xizmeta Cemal jî bikim. Barekî giran ketibû stuyê min. Ji bo wê jî karên hê hêsan min dikirin. Pir caran diçûm qeraja otobosan, li dor otobosan çerx dibûm. Rêwîyên gundî dihatin, ka bîletê ji ku bikirine pirs dikirin, min digot hûn siyar bin, ez mavên im, pera bidin min bîletê nexwaze. Min perê wan digirtin ji wir bi dûr diketim. Va kara yî hê qole û bêtirs bû.

Rojeke biharê bû. Cemal hê di hepsê de ye, bêhna min teng dibû. Ber êvarê çûm qerajan. Ro yê li ber ava bû. Eyamekî xwaş hebû. Min bîleteke xwe kirî li otobosê Îzmirê siyar bûm. Me va ya pir caran dikir. Kalekî 55– 60 salî hat li kêleka min rûnişt. Kincên wî pak û bi ûtî bûn. Diçû seredana lawê xwe. Digot “Lawê min, li Îzmirê bazirgan e, dewlemende.” Gotineke mezina heye “Helîna marî kwîr berê çêkiri ye.” Min dilê xwe de got, rizqê min î bi lingê xwe

hat. Mîn jî xwe wek mamoste da nasîn. Ji Tokatê me, ji seredana dê û bavê xwe dihatim.

Çend saeta rêwîtiya me dewam kir, nîvê şevê bû, lampayên otobosê vemirîbûn. Kalê me xorexor ketibû xewê. Min pîstê ceketî wî ji hev kir, ti bi xwe nehêsi. Hêdî hêdî, min cûzdanê wî ji berîyê kişand. Perene pir tê da bûn. Min pere girtin, cûzdan şuva kire berîya wî. Nîv saetê şuva, otobos bo rêwî vêsên/mola kete petrolekê. Ez, peya bûm, dor paş xwe mês kir li perî walî rê petrolek din hebû. Ber wî jî otobos hebûn. Derbasî wira bûm, li otobosê dihere Ankarayê siyar bûm û vegeirîm.

Silo hetanî nîvro li hotelê vêsiniya xwe girt. Zikê xwe têr kir şuva berê xwe da rêya hepisxanê. Çû seredana hevalê xwe. Li hevdu pirsîn. Pere dane Cemal, hate hotelê. Çend rojan gêj gêj, li bajêr wext derbas kir. Hêdî hêdî ew perana ji kêr dibûn. Ji wê rojê vir de, ti bi dere kar neketibû. Şevêkê, Abuzer bane wî kir û kişandê hoda xwe. Wek hertim şîret dikir. Digot: “Malê diza nabe. Bi diziyê tu ti mala nakî. Kesî bi diziyê ti mal nekiriye. Dawîya vî karî, ya mirin e, an jî hepis e. Bi

gura min bike. Vegere here gundê xwe, herkes çing debara xwe dike, tu jî wê bike.” Silo, seri di berda qe deng nedikir, ti bersîv nedidan wî. Çi dibêje rast bû. Silo jî ji seri de dudilî bû. Lê nedizanî çî bike. Carekê ketibû dest nerindekî û rêke neçê. Xwe xilas nedikir.

Silo: Çend meh in, neçû bûm gund. Îda Şekir nêzik dibû. Bi ser gotinên Abuzer de neçû bûm kar jî. Bê pere bûm. Roka erefê, çûm qeraja li otobosê Konyayê sîyar bûm, çûm gund. Dayîka min xenê û şa bû. Lê heşê wê jî negêhiştinê, ez tim bi pere bûm. Vê carê çî bû, ez bê pere me. Di mal de şekir û çay, titûn, şekirê îdê tişteke tune. Min jê re got, ez ji kar avitim. Bi wê jî xenê bû got: “Careke din venegere Ankarayê. Li gund bimê û karê xwe bike. Xwedê yî mezin e, sibê îd e, here camîyê /mizgeftê Xwedê yê rizqa bide.”

Sibê, rabûm çûm nimêja îdê. Di camîyê de, li refa nimêjê dawestînî. Li refa ber min, pêş min merîyekî gundîyê me, li Ankarayê karmend û dewlemend dawestî bû. Dema çû şezde, min dî berîya wî ya paşîyê helpekî ye û cûzdanê wî xuya dikir. Xwedê rizqê min şandibû. Min bi herdu tilîyên

xwe cûzdan ji berîyê kişand û kire berîya xwe. Nimêj bi dawî bû û civat belav dibû, ez danewestîm, çûm dikana gund. Titûn, çay, şekir, qolonya û şekirê îdê kirî û bi lez çûme mal. Dayîka min dest min de ew pakêtana dîtî got: “Min ji te re negot, here nimêja îdê Xwedê yê rizqê te bide.” Min dilê xwe de: Tu dia li van herdu tilîyan bike, ew hunera van tilîyan nebûya, te rizqê bidîya, got.

Silo çend rojan li gund ma. Dudil bû. Vegere an venegere biryar nedida. Gotinên Abuzer rast bûn. Kesî bi dizîyê ti mal nekirine. Debara dinê bi qar bû. Ne dizanî çî bike. Bi wan malhulena ve carekê din kete rêya Ankarayê. Hevalê wî Cemal hê di hepsê de wû. Nêzikî du salan bû bi dizîyê debara xwe dikir. Ji gund vegeirî şuva qasî mehekê, çend caran çû kar û hat. Li berîyan dixist. Diçû qeraja otobosan, rêwî dixapandin û debara xwe dikir.

Silo: Sibê rabûm, çûm ber nexwaşxanekê. Pîr qelebelix hebû. Ketim hundirê nexwaşxanê, nexwaş ketibûn dorê ku mieyene bin. Ez jî ketim dorê. Jineke 35–40 salî li ber min bû. Hatibû, derzîyekê li xwe xe. Min jî jê re

got, serê min çend roj in dêşe, dixwazim derzîyekê li min xim ez hatim. Dor hate jinikê, poşeta dest de da min got: “Ji kerema xwe re bigire, derketinê tu ê bidî min.” Ew kete hundir, ez ji dorê derketim, bi lez çûm hotelê. Min poşet vekir nasname ya wê, hendik pere û pir xet/kaxiz tê da bûn. Herhal ew xetana raporên nexwaşîya wê bûn. Bi wê rewşê, morala min xirab bû. Dibe ku min tiştekî pir neçê kiribû. (Mînak, dizîyên baş jî hebin.) Min hetanî êvarê hatina Abuzer pa. Bi êvarê çûm hoda Abuzer. Min ew xetana dane wî. Ka ew çi ne. Abuzer ew xwandin şuva vegerî min got: Tu zanî te çi kiriye? Te çentê jineke nexwaş

şêrpençeyê dizîye. Şêrpença pêşîra ye. Ew perana, ji te pirtir bi wê gerek in. Raporê wê jî te anîn e. Ew fiqara, niha çi bike? Tu ê ji vî gunehî çing xilas bî? Çend caran, ez ji te re dibême dest ji vî karî pîs berde, pêşeroja vi karî tune. Here gundê xwe, herkes çing zikê xwe têr dike, tu jî wê bike.”

Ez bi wê, pir bi ber xwe ketim, êşiyam. Hetanî sibê, wê şevê xew nekete çavên min. Destê berbangê, ji hotelê biderketim. Çûm ber nexwaşxanê. Ew poşeta jinikê, avite fiçîyek qirşqala û min berê xwe da qerajan. Li otobosê sîyar bûm, hatim gundê xwe. Min, çoyê xwe î şivanîyê ji nû ve kir dest xwe.

DI ÇÊKIRINA BÎRA KOLEKTÎF A KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN DA ROLA KOVARA BÎRNEBÛNÊ

Sevgi Erdem

Destpêk

Jean Louise, qehremanê piçûk yê romana Kuştina Bilbil, dibêje: “wek ku pêlkirina bişkovekê bû di bîra min da û ev bişkov hatibû vêxistin” (Lee, 2021: 160). Bîranîn, fonksiyonên bîranînê ku bi pêlkirina bişkovekê paşerojê bi bîr tîne û vedijîne. Bişkova ku lê hatiye pêlkin, carna bîrdarîyek an bîranînek e, cih an cîh, nav, nîgar, sembol, tam an bîhnek e – mîna qetlîama bêhna sêvê ye ku di sala 1988 an de li Helebçeyê ji aliyê rêveberîya Seddam Husên ve li dijî kurdên Iraqê pêk hat. Nalîna ku vediguhere straneke gelêrî – wek “Way lê Gulû Yaman Gulû¹” ji bo keça ermenî Gulîzar – an jî lorînek. Carinan ew roman, çîrok, rojname an kovarek e ku em dixwînin.

Bi organên medyayê yên ku ji bo eşkerekirina qada avakirina

hafizeya civakî hatine amadekirin û weşandin, hêmanên çandî yên civakan ên ku hewl tê dayîn bîn jibîrkirin derdikevin holê û bi vî rengî hafizeya kolektîf ji nû ve dest pê dîke ku xwe tamîr bike û tiştên ku ji bîr kiriye bi bîr tîne.

Di vê lêkolînê de, kovarê Bîrnebûnê ku li Swêdê ji aliyê komek weşangerên kurdên Anatoliya Navîn ve tê weşandin ku qedera wan bi koçberîyê ve hatiye çêkirin û dikarin rabirdûya çandî li cîh(ên) ku jê hatine, hilgirin û li ser rola wê ya di avakirina hafizeya civakî de hatiye lêkolînkirin. Peyva Bîrnebûnê di kurdî de hem tê maneya bîr û hem jî bîrewerîyê û kovara Bîrnebûnê bûye amûrek girîng ku hafizeya kolektîf li herêmê di binê bîrekê de winda nebe û bigihêje nîfşên paşerojê, ji bo têkoşîna ji bîrbûnê xilasbûyîn e. (Yüksekkaya, 1997: 6).

1 <http://www.agos.com.tr/tr/yazi/11074/gulizarin-hepimize-ogrettigi-eri-im> Tarihi: 03.01.2022
<https://www.habersanliurfa.net/yazarlar/misafir-yazar/vay-le-gulo-yaman-gulo/29124/> Erişim Tarihi: 03.01.2022

1. Paşpêhatîya dîrokî ya kurdên Anatolîya Navîn

Tê texmînkirin ku komên nifûsa kurdan ên bi navê kurdên Anatolîya Navîn li deşta ku lê dijîn xwedî rabirdûyeke dîrokî ya nêzî pêncsed salî ne. Li Enqere, Konya, Kirşehir û Aksarayê, li Çorum, Yozgat, Qeyserî û parêzgehên din ên herêmê zêdetirî mîlyonek kurd hene (Özgür, 2017).²

Derbarê dîrok û sedemên koçkirina kurdan bo Anatolîya Navîn de nêrînên cihêreng hene. Li gor hin lêkolîneran şopa kurdan li herêmê di sala 1184an de hatiye dîtin, li gor hinekan jî polîtîkaya koçkirina bi darê zorê û koçkirina komî di serdema Selîmê Yekem de pêk hatiye (Yavuz Sultan Selim, 1470–1520). Sedemên sereke yên koçkirinê, bicibûna eşîrên kurdan ên koçer û bac, ku eşîran li ser rêyên koçberîyê li hev dixin û lezkirina pêvajoya asîmîlasyonê ye (Özgür, 2017).³

Weke ku li jor jî hat behskirin, her çendî di derbarê dîroka hatina kurdên Anatolîya Navîn ên bi sedsalan de li vê herêmê ti agahîyek teqez tunebe jî, di çavkanîyên – Arkeologê Fransî Georges Perrot (2021: 91), Rohat Alakom (2004)

ji kurdên Tirkîyê: Beşa 1, r.18), Sedat Ulugana (2015: 9–10–11–12) û Hacî Çevik (2021: 41–42) – ku em dikarin li ser vê mijarê bibînin da tarîxa ku kurdên Anatolîya Navîn bi kêrî ve sê sedsal û berê hatine. Ev koça ku di sedsala 18an û berî wê de dest pê kir, ji ber sedemên aborî, siyasî û îdarî bi sedsalan berdewam kir û îro jî ji ber sedemên bi vî rengî berdewam dike. Ji ber ku hawîrdora pevçûnên ku di salên 1980yî de li herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Anadoluyê yên Tirkîyeyê dest pê kir û heta nîvê pêşîn yê salên 1990î bi tundî dewam kir. Gelê kurd li van herêman, bi girseyî, bi taybetî li bajarên mezînan ên welêt, wek Stenbol, Îzmîr û Enqere bû sedem ku koçî gelek bajarên herêmên navend û rojava bikin (Yıldız û Bayram, 2007: 319). Wekî din, em dibînin ku koçberî ji ber zêdebûna nifûsa xwezayî ya bi nîsbeten bilind û nebûna derfetên kar li van herêman berdewam dike. Wek mînak, malbatên ku di van salên dawî de ji parêzgehên wek Mêrdîn, Agirî û Wanê koçî navçeyên wek Şereflîkoçhisar li Enqereyê û Kuluya li Konyayê ki-

2 <https://m.bianet.org/biamag/medya/190791-birnebu-20-yillik-yayincilik-mucadelesi>, Erişim Tarihi:07.12.2021

3 <https://m.bianet.org/biamag/medya/190791-birnebu-20-yillik-yayincilik-mucadelesi>, Erişim Tarihi:07.12.2021

rine, bi şiklê koman li van herêman bi cih dibin û komên nufûsa kurdan ên nû ava dikin.

